# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1210 | 6-Cotmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/



**Navnîşan**

www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55

nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218


## Erbane di destên biçûk de jîn dibe



Zarokên Mexmûrê di her kêliya jiyanê de xwe pêş dixin, fêrdibin û niha jî bi destên xwe yên biçûk ruh didin erbanê. Xeyala wan ewe ku di pêşerojê de wek gerîlayên YJA-STAR'ê bibin yek ji hunermendên ku çanda Kurdewarî diparêzin.

Erbane, amûreke lêdanê û gelek kevnare û di nav Kurdan de bi taybetî jî li Rojhilata Navîn xwedî cihekî girîng û taybet e. Her çiqas di derbarê dîroka Erbanê de agahiyek zelal tunebe jî, lê tê texmînkirin ku dîroka wê ya hezar salan heye. Ev amûr di nav çandên Mezopotamya, Faris, Ereb û Kurdan de xwedî cihekî kûr û qedîme.

Ji bo Kurdan erbane ji amûreke muzîkê wêdetir, di heman demê de beşeke bingehîn a rê û resmên çandî û olî ye. Bi taybetî di merasîmên olî, dawet, şahî û şînê de tê lêdan. Erbane yek ji wan enstrumanên ku pêkhateya rîtmîk a muzîka Kurdî diyar dike û bi muzîka Kurdî re tê naskirine. Girêdana Erbanê bi Kurdan re jî bi nasnameya çandî ya gelê Kurd ve girêdayî ye. Kurdên ku di dîrokê de rastî gelek komkujî û qirkirinan hatî êş, kêfxweşî, hêvî û ruhê xwe yê berxwedanê bi erbaneyê tînin ziman.

Ev amûr dihêle ku Kurd mîrateya xwe ya çandî zindî bihêlin bêyî ku têkiliyên xwe yên bi rabirdûyê re qut bikin. Dengê Erbanê ruh, kevneşopî û nasnameya Kurdan nîşan dide. Ji ber vê sedemê jî erbane ji bo Kurdan ne tenê amûreke muzîkê ye, di heman demê de semboleke, şêweyek ya îfadekirinê ye. Kurd xwe, dîrok û çanda xwe bi erbanê îfade dikin.

Ev amûra xwedî dîrok û qedîm, niha di destê zarokên Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) de ruh digire û di bin darên qedîm ên Parka Rêber Apo de reng û şêwe digire. Komek zarokên Mexmûrê ji bo ku xwe fêrî erbaneyê bikin û çanda Kurdewarî biparêzin, berê xwe dane Stêra Zêrîn a wargehê û li wir ji aliyê Mamostayê muzîk û amûran Rûheyv Efrîn ve têne perwerdekirin. Mamoste Rûheyv ku zarokatiya xwe li Navenda Çand û Huner a wargehê derbaskiriye, niha jî perwerde dide zarokên wargehê û dibêje ku ew di xwendevanên xwe de zaroktiya xwe dibîne.

### Têkiliya hevaltî pêşxisine

Ev sê heyvin ew dibin sêwana Stêra Zêrîn de perwerdeya erbaneyê dide xwendevanên xwe yên biçûk. Mamoste Rûheyv têkildarî girîngiya erbaneyê û perwerdeya ku dide, axivî û wiha pêde çû: "Navenda Çand û Huner ya wargehê û Stêra Zêrîn ji ber werza havînê û nebûna dibistanê, çend perwerdeyên çandî dane destpêkirin. Em jî niha li vir perwerdeya erbaneyê didin. Em bi xwendevanên xwe re weke hevalên hevin. Em bi hev re demên gelek xweş derbas dikin. Pêşketinên xwendevanan hene, hemû jî bi dilxwazî tên perwerdeyê. Me di destpêkê de girîngiya erbanê û şêwazên rîtmên muzîkê bi hev re dît û naskir."

### Piştgiriya malbatan hêz dide wan

Mamoste Rûheyv da zanîn ku ev perwerdeyên ku tên dayîna zarokên wargehê, ji aliyê xelkê wargehê ve erênî tên dîtin lu kêfxweşiyek mezin daye avakirin û wiha axaftina xwe domand: "Malbatên me ji ber perwerdeyên tên dayîn gelek kêfxweşin. Niha bi sedan xwendevan tên perwerdekirin û em jî li vir perwerdeya erbaneyê dibînin. Amûra ku dengeya stranan çêdike, erbane ye. Erbane xwedî dîrokek kûr û bi wate ye. Hertim Kurdan erbane bikaraniye û amûrek sereke ya çanda Kurdî û taybet jî ya Rojhilata Navîne. Tişta ku civakê li ser lingan digire, çand û hunere. Divê em hîn zêdetir girîngî bidin çandê û banga min ji Kurdan re ewe ku xwedî li çand û hunerên Kurdî derbikevin."

### Bi kêfxweşî tên perwerdeyê

Xwendevana bi navê Sureya Avyanî jî li ser pêvajoya perwerdeyê û mamosteya xwe axivî û wiha hezkirina xwe ya li beramberî erbane û mamosteya xwe anî ser ziman: "Em bi hevalên xwe re tên perwerdeya erbanê û em gelek ji mamosteya xwe hez dikin. Ev sê heyvin mamosteya me bi me re mijûl dibe û me perwerde dike. Ez bi hevalên xwe re têm perwerdeyê û ez gelek kêfxweşim. Ez dixwazim xwe fêrî her cure amûrên muzîkê bikim. Dibistan hatiye girtin û em jî di demên xwe yên vala de berê xwe didin Navenda Çand û Huner a wargehê. Ji ber ez têm vir, dayîka min gelek kêfxweşe."

Xwendevana biçûk Sureya di dawiya axaftina xwe de xeyalên xwe ji me re parve kir û bi lêv kir ku wê di televîzyonê de erbane di destê gerîlayên jin de dîtiye û xeyal dike ku dema mezin bû, bibe yek ji wan parêzvanên çanda Kurdî.

Xwendevanên biçûk herî dawî bi rêya ajansa me stranek diyarî tevahî gerîlayên YJA-STAR'ê kirin.

**ROJ NEWS**

## Hejmara (23) a Kovara Şermola Derket

Hejmara (23) a kovara Şermola ya wêjeyî û çandî ku bi zimanê kurdî û erebî tê weşandin, derket. Dosyaya vê hejmarê "Pirtûkxaneyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê" ye, di hejmarê de hejmarek nivîskar û rewşenbîran nêrînên xwe li ser rola pirtûkxaneyan di jiyana wêjeyî û çandî de û girîngiya avakirina Pirtûkxaneya Niştimanî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, anîn ziman. Her wiha Desteya Sernivîskariyê ya kovarê raporek li ser rewşa pirtûkxaneyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê amade kiriye.

Her wiha di hejmarê de çend mijarên wêjeyî û çandî ku ji aliyê nivîskarên Rojavayê Kurdistanê ve hatine nivîsîn hene.

Hejmara (23) a kovara Şermola 184 rûpel in, bi kurdî û erebî hatiye çapkirin.

Di beşa kurdî de ev berhem hene:

**Pêşekî**

-Pirtûkxaneyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê "Pirtûkxaneya Niştîmanî Pêwîstiyeke Tekez e"..(Desteya Sernivîskariyê)

**Dosyaya Hejmarê**




-Rapirsiya "Şermola" derbarê rola pirtûkxaneyan û avakirina Pirtûkxaneya Niştimanî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê.. (Desteya Sernivîskariyê)

-Pirtûkxaneyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê (Desteya Sernivîskarîyê)

**Hevpeyvîna Hejmarê**

-Li gel Nivîskar Ebbas Mûsa ye (Hevpeyvîner: Aram Hesen)

**Lêkolîn**

-Ji helbestên Melayê Cizîrî: DÎSA JI NÛ BÊHAL E DIL .. (Diyar Bohtî)

-Kurd û Perwerde .. (Berzo Mehmûd)

**Pirtûkên Derketî**

-Pirtûkên Derketî.. (Desteya Sernivîskarîyê)

**Serbest**

-Kanî Kekê Min?!.. (Salihê Heydo)

**Helbest**

-Ez li vir im.. (Mihemed Cumaa)

- Hew.. (Aras Qasim)

### Sudoku: Bersiv 8

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | 8 | 4 | 7 | 1 | 2 | 9 | 6 | 5 |
| 1 | 9 | 5 | 6 | 4 | 8 | 7 | 2 | 3 |
| 2 | 6 | 7 | 5 | 3 | 9 | 8 | 4 | 1 |
| 9 | 3 | 2 | 4 | 8 | 5 | 6 | 1 | 7 |
| 8 | 4 | 6 | 1 | 9 | 7 | 3 | 5 | 2 |
| 7 | 5 | 1 | 3 | 2 | 6 | 4 | 9 | 8 |
| 6 | 7 | 9 | 2 | 5 | 3 | 1 | 8 | 4 |
| 4 | 2 | 8 | 9 | 7 | 1 | 5 | 3 | 6 |
| 5 | 1 | 3 | 8 | 6 | 4 | 2 | 7 | 9 |

### Sudoku:Pirs 9

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 5 | | | 2 | | | |
| | 3 | | | | | 7 | | |
| 2 | | | 1 | | 5 | | 3 | |
| 6 | | 7 | | 9 | | | 2 | 3 |
| 5 | | 4 | | 2 | | 8 | | 6 |
| 9 | 2 | | | 8 | | 1 | | 5 |
| | 9 | | 8 | | 3 | | | 7 |
| | | 8 | | | | | 6 | |
| | | | 4 | | | 3 | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Xwê li birîna wî dike:**
- Êşa wî ya berê tîne bîrê; kêmayiya wî tîne bîrê; pê li birîna wî ya kevin dike.

**Xwe xerîb kir:**
- Ev demeke dirêj e; em nabînin; me bîriyê kiriye.

LI SER KEYF, KELECAN Û BEXTIYARIYÊ

**Av li dilê min kir:**
- Dilê min honik kir; li gorî dilê min axivî; li gorî dilê min kir; mizgîniyeke xweş da min.

**Bask bi min ve hebûna ezê bifiriyam:**
- Ji bo kesên dilê wan rihet, tê gotin.

**Bask pê ve tinebûn ku bifire:**
- Keyfa wî pir hat.

**Bask bi min ve çêbûn:**
- Keyfa min pir hat.

**Bask bi min ve hatin:**
- Bi heman wateyê.

**Baş bûye çavê kul derman bûye:**
- Baş bûye ku wisa li te hatiye; tu ji xwe re nasekinî wisa li te tê.

**Bavê felekê ye:**
- Her dem di nava keyf û şahiyê de ye.

**Bayek ji ber serê xwe berda:**
- Bêhna xwe vekir; têra xwe geriya.

**Beng benga wî ye:**
- Keyfa wî pir hat.

**Beq bi avê serxweş dibe:**
- Ji bo kesên bi tiştên asayî dilşad dibin tê gotin.

**Berxa li ber du makan e:**
- Pir bişans e; keyf keyfa wî ye; ketiye xêra Xwedê.

**Bi lotikan ketiye:**
- Pir bikeyf e; ji keyfa dilîze.

**Cihê xwe dît:**
- Tişta ku heq bû hat serê wî; baş bû ku wisa hat serê wî.

**Cihê xwe germ kiriye:**
- Pişta wî qayîm bûye, xwe bi cih kiriye; piştgirî girtiye; cihê wî bi dilê wî ye.

**Çavên wî li şûn ve neman:**
- Jiyana wî di xweşî û bextiyariyê de derbas bû; tişta xwestî bi dest xist; bêxem çû.


**Çavên wî li paş neman:**
- Bi heman wateyê.

**Çav li serî direqisin:**
- Pir şa bûye; ji keyfa xwe winda kiriye.

**Çavên wî direqisin:**
- Pir dilxweş e.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Rojnamegera pêşeng: Gurbetellî Ersoz




Şopdarên Gurbetelliyê li Îranê Ayfer Serçe, li Mexmûrê Denîz Firat, li Şengalê Nûjiyan Erhan, li Rojava Dilîşan Îbîş û Dilovan Gever û li Silêmaniyê Nagîhan Akarsel... Rojnamevanênjinênkurdûxebatkarênçapemeniya azad, li ser şopa Gurbetellî li Kurdistanê lêgerîna xwe ya heqîqetê berdewam dikin.**R-2**

## 'Herêm ber bi şer û pêvajoyên girantir ve diçe'



Rojnamevan Erdogan Altan da zanîn ku Hamas bi êrişa xwe ya dawî ya li dijî Israîlê perçiqî û nedikarîbû wê êrişê veguherîne qezanckirineke siyasî an jî civakî û wiha got: "Ji niha û şûn de wê herêm hin şer û pêvajoyên girantir bijî.**R-3**



## Nagîhan Akarsel.. Rêwiya Heqîqetê

Jinên şopdarên rêya şehîd Nagîhan Akarsel diyar kirin ku ew ê li ser rêya heqîqeta xeyalên Nagîhan di pêşxistina zanista Jineolojî û serxistina şoreşa jinan de, pêk bînin.**R-6**

## Avakirina sînema zindîhiştina bîranîna zarokên ku di komkujiyê de şewitîn



Ji bo bîranîna zarokên kurd ên ku di sînemeyayê de hatin şewtandin zindî bimîne, Komîna Film a Rojava, şaredariya gel ya bajarê Amûdê û bi destekdayîna hin saziyên civakî dest bi avakirina sînemayeke nû bi rûberê hezar û 162m li bajarê Amûdê kir.**R-7**


# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1210 | 6-Cotmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S


# KOMPLO PÊVAJOYA QIRKIRINÊ YE

Komploya Navneteweyî ku di şexsê Rêber Abdullah Ocalan de li dijî Tevgera Azadiyê, gelê kurd û tevahiya gelên azadîxwaz hate kirin, 9'ê Cotmeha sala 1998'an dest pê kir û heta niha berdewam e. Lê bi saya berxwedana dîrokî ya Rêber Apo û Tevgera Azadiyê, hêzên paşverû û global ku komplo pêk anîn, negihiştin armanca xwe.**R-5**






## Kobanê ne ket, Serket...(2)

Serhildana mezin du roj li pişt xwe hiştibû. Di gel qedexeyên kolanan, tang, top û çeteyên AKP'ê jî gelê kurd bi paş ve gav nediavêt. Serhildan di 8'ê Cotmehê de jî berdewam dikir.**R-4**



**Bi Netanyahu terbiyekirin!** — Ahmet Aktaş — R-4



**Awazê senteza Rêber Apo ya azadiyê dilê milyonan dilerizîne** — Idrîs Henan — R-5



**Şerê tunekirinê bi navê Olan** — Hafiz Ahmet Turhalli — R-6



**Heyran Jaro** — Sîpan Şînda — R-7

# Rojnamegera pêşeng: Gurbetellî Ersoz

Şopdarên Gurbetelliyê li Îranê Ayfer Serçe, li Mexmûrê Denîz Firat, li Şengalê Nûjiyan Erhan, li Rojava Dilîşan Îbîş û Dilovan Gever û li Silêmaniyê Nagîhan Akarsel... Rojnamevanên jin ên kurd û xebatkarên çapemeniya azad, li ser şopa Gurbetellî li Kurdistanê lêgerîna xwe ya heqîqetê berdewam dikin.

**Navenda Nûçeyan**

Rojnameger Gurbetellî Ersoz li Kurdistan û Tirkiyeyê yekem gerînendeya giştî ya weşanê bû. Li pey xwe mîrateyeke girîng ji bo rojnamevaniya azad hişt. Gurbetellî, zaneya jiyana azad, afrînera di oxira lêgerîna heqîqetê de, bû pêşenga têkoşîna azadiya jinê. Gurbetellî, bi kesayeta xwe ya pêşeng, li dijî pîvan û kevneşopiyên paşverû yên civakî, li dijî hişmendiya serdest a medyaya mêr û pergala wê ya desthilatdar bi estetîk û fikra jinê, bi pênûsa xwe bû avakera jiyana azad. Şopdara heqîqetê Gurbetellî, di 7'ê Cotmeha 1997'an de, bi komek hevalên xwe re li başûrê Kurdistanê di şer de jiyana xwe ji dest da û tevlî karwanê nemiran bû. Gurbetellî, ji bo hemû jinan û ji bo rojnamevanên jin bû çiraya jiyanê.



**Di dibistanê de zimanê cuda...**

Gurbetellî di 11'ê Tîrmeha 1965'an de li gundê Akbulut ê Palu ya Elezîzê hat dinê. Dema hat dinê bavê wê li Elmanyayê wek karker dixebitî. Ji ber wê jî navê wê kirin Gurbetellî. Di dibistana seretayî de ji ber gotinên wê yên kurdî di navbera hevokan de derbas dibin, ferq dike ku heval û mamosteyên wê fêm nakin û ew jî matmayî dimîne. Piştî Gurbetellî fêm dike li dibistanê zimanê wê cuda ye pirsên çima, ji bo çi dipirse. Gurbetellî wiha dibêje: "Min xwend û bê navber min xwend. Heta westiyam min radyo guhdar kir û ez baş hînî tirkî bûm." Dayika wê Fatma Ersoz ji ber ku nekarîbû bixwîne, dixwest zarokên wê bixwînin û heta nîvê şevê ranediket da ku zarokên wê bixebitin. Gurbetellî ku ji zarokatiya xwe ve li cem ên mafdar û bindest sekinî, dayika xwe bi hişmendî û wêrekiya xwe bi tenê nehişt. Gurbetellî bi dayika xwe re bi kirmanckî diaxivî û ji ber ku li dibistanê bi tirkî nedizanî xwendekaran henek pê dikirin û di waneyan de zehmetî dikşand. Tevî van hemûyan jî dest jê berneda û xebitî.

**Şoreş û têkoşînê nas dike**

Zarokatiya wê ji gund zêdetir li Edenê derbas dibe û di ciwaniya xwe de şoreş û têkoşînê nas dike. Piştî zanîngehê diqedîne li Enstutiya Zanistên Fenê ya Çukurovayê li ser 'Enerjî û Derdorê' lîsansa bilind dike û gelek ji laboratuvarê hez dike. Serokê kursiyê rojekê dibêje: "Ev hezkirina te ya laboratuvarê şertê yekem yê zanyariyê ye. Lê vê ji bîr neke tiştên tu hîn dibî, tu bi kesên din re parve nekî tu wateya wê namîne." Gurbetellî di vê navberê de rojnamegeriyê jî dike. Di 10'ê kanûna 1990'î de tê girtin û 15 rojan di bin îşkencê de dimîne, 2 salan li girtîgeha Meletiyê dimîne. Piştî tê berdan dest ji têkoşînê bernade, rojnamegeriyê berdewam dike.

'Bêguman girîng e jinek kurd dibe gerînende'

Gurbetellî di rojnameya Ozgur Gundem ya di 26'ê nîsana 1993'yan de bi dirûşmeya "Rastî di tariyê de namînin" de dest bi weşanê kir de, dest bi xebatê kir û bû gerînendeya giştî. Di dîroka çapemeniya Tirkiyeyê de ev yek bû û cara yekem jinek bibû gerînendeya giştî. Gurbetellî vê wek serkeftina têkoşîna jinê dinirxîne û wiha dibêje: "Bêguman girîng e ku jinek kurd dibe gerînendeya giştî. Di salên dawî de jinên kurd ji mêran xurtir rê da ber xwe. Cihê îro ez hatimê jî li gel hewldana min girêdayê vê ye."

**13 rojan îşkencê lê dikin**

Di 10'ê Kanûna 1993'an de di roja Mafên Mirovan a Cîhanê de bi ser buroya Ozgur Gundemê de tê girtin, Gurbetellî bi hevalên xwe yên din re tê binçavkirin û tê girtin. 13 rojan di bin çavan de rastî îşkenceyan tê. Dişînin girtîgeha Sagmacilar. Di hezîrana 1994'an de tê berdan. Dîsa xebatên xwe yên rojnamegeriyê dimeşîne.

**'Bi xatirê te bajar...'**

Gurbetellî ji bo jinên rojnameger yên hatine qetilkirin wiha gotibû "Ger çapemeniyê rastî binivîsiya wê evqas mirov nemiribana" û piştre dibêje "Bi xatirê te bajar, bi xatirê we bajarno" û berê xwe dide çiyê. Gurbetellî têkoşîna xwe li çiyayên Kurdistanê bide meşandin û di sala 1995'an de tevlî nava gerîlayan dibe. Rojnivîska ku di navbera salên 1995 û 1997'an de nivîsî, piştre pirtûka bi navê "Rojnivîska Gurbet Min Dilê Xwe li Çiyayan Neqişand" hat çapkirin.

**'Gurbet bang li hemû mirovan dike**

Di pêşgotina pirtûkê de derbarê Gurbetellî de ev gotin cih digrin: "Naskirina Gurbet ango Zeyneb; tê wateya naskirin û fêmkirina jinên kurd ku di rêya azadiyê de pêşketin û ezmûnên mezin dijî ye. Lê nivîsa wê ango rojnivîska wê ne tenê aydê wê ye. Zeyneb ango Gurbet bang li hemû mirovan dike. Timî qala nirxên mirovan û dilpakiyên mezin dike. Hesreta xwe ya neteweya kurd, hêvî, hêrs û hezkirinên xwe di rûpelek de bi nazikî dineqişîne."

**'Neteweyek wiha tê parçekirin'**

Gurbetellî der heqê rêwîtiya xwe ya ji bo çiyayan de ev helbest nivîsandiye:"Ax Kurdistan ax, çima qedera te reş e, yan qedera me, bila sonda me be wê biguhere, aliyê jor ê çepê Bakurê Kurdistanê ye, pişta min Rojavayê Kurdistanê, aliyê min ê rastê jî başûrê Kurdistanê ye, her sê xalan dibînim. Dijminê hov, ma malbatek, neteweyek wiha tê parçekirin, perçiqandin û bi mirinê mehkûmê jiyanê tê kirin?"

**'Ev der Kurdistan e'**

Gurbetellî di beşeke pirtûka xwe de heyraniya xwe ya ji bo çiyayên ku gihîştiye wan, bi van hevokan vedibêje: "Bihuşt e, lingê yekem ê welat bihuşt e, cara ewil ewqas kûr ji hemû hucre û hestiyên xwe hîs dikim ku gihîştime welatê xwe Kurdistanê. Li gorî heval dibêjin bêyî ku rawestim qêriyam. Ev der bihuşt e, heval bihuşt e, ev der Kurdistan e. Bibezin heval bibezin bihuşt e bibezin, bibezin bihuşt e, bibezin ber ava bêhempa, bibezin ber daran bihuşt e her der bihuşt e..."

**Tu hêz nekarî fikir û afrîneriya wê tune bike**

Gurbetellî di sala 1997'an li Herêma Federal a Kurdistanê di şerekî de tevlî karwanê nemiran bû. Sekna xwe ya bi aqil a xurt a salonên dadgehê, li çiyayên azad jî domand. Gurbetellî ji pênûsan dûr neket. Şopdarên wê, ji bo rastiya di nava tarîtiyê de derxin holê, li her aliyê cîhanê çapemeniya şoreşgerî dimeşand. Tu hêzan nekarî fikir û afirîneriyên Gurbetellî tune bikin.

**Berhemên rojnamegerên jin**

Rojnamevanên jin ên kurd û xebatkarên çapemeniya azad, li ser şopa Gurbetellî li hemû welatên lê ne, li bajar û çiyayên Kurdistanê rojnamegeriya heqîqetê berdewam dikin. Gelek kovar, rojname, ajansên nûçeyan, televîzyon, radyo û malpêrên li Kurdistan û Ewropayê xwe dispêrin vê mîrateyê. Hin ji wan yekemîn ajansa nûçeyan a jinan JINHA ye û ji wê heta JINNEWS'ê, heta yekemîn televîzyona jinan Jin TV, kovara jinan Jina Serbilind a li Ewropayê tê weşandin, Star Fm ku yekemîn radyoya jinan e ku li Rojava weşanê dike û gelek kovar, rojnameyên din...

**Rojnamegerên canê xwe feda kirine**

Gelek nûçegihan, nivîskar, wênekêş û belavkarên jin di dîroka çapemeniyê de bi tundî hatin cezakirin, kuştin, girtin û bi zorê sirgûn kirin. Şopdarên Gurbetelliyê li Îranê Ayfer Serçe, li Mexmûrê Denîz Firat, li Şengalê Nûjiyan Erhan, rojnameger Nagîhan Akarsel, nûçegihana ANHA'yê Dilîşan Îbîş û Dilovan Gever li Rojava tenê çend ji wan rojnamevanên jin in ku di vê oxirê de canê xwe feda kirine…
7'ê Cotmeha sala 2013'yan wekî Roja Rojnamevaniya Jinên Kurd hate ragihandin.

# Keça agir û rojê; Arîn Mîrkan

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**Di 5`ê Cotmeha 2015`an de têkoşera azadiyê Arîn Mîrkan bi cesaret û vîneke xurt, ji bo parastina hevalên xwe û Kobanê bedan xwe kir pêtên agir û çeteyên DAIŞ`ê şewitand, Arîn Mîrkan bi vê çalakiya xwe ya fedayî ji cîhanê re ragihand ku bila beden nebe, lê welat û fikir azad be.**

Berfa zozanan a li ser Kaşê Miştenûr, keça agir û rojê, qîrîna rindîxana welatê Serhedê, destana çiyayên bilind... Belê, Rêheval Arîn Mîrkan a ku pora xwe bi kenê zarokên Kobanê hine dayî û mîna bi sedan hevalên xwe, bedena xwe kir mertal, ji bo parastin û rizgarkirina bajarê Kobanê. Cangoriya azadiyê bi vê gava dîrokî û di xeta xwe ya Apo`î de, ji hemû cîhanê re ragihand ku bila beden nebe, lê welat û fikir azad be.

**Kurtejiyana têkoşera berxwedêr 'Arîn Mîrkan'**

Arîn Mîrkan bi navê xwe yê rast Dilara Kînc. Arîn di sala 1992'yan de, li gundê Mîrkan ango Hisê yê girêdayî navçeya Mabeta ya Efrînê ji dayik bûye. Dibistana xwe ya seretayî û navîn li gundê Mîrkan xwendiye. Arîn mîna Zîlan û Bêrîtan Keça malbateke welatparêz e. Û xwedî têgihiştineke rastiya Kurd û Kurdistanê bû. Lewra têkoşera bêhempa Arîn Mîrkan a ku bûye navnîşana berxwedana Kobanê, hîn di temenê xwe yê biçûk de ku di sala 2007`an de tevlî Tevgera Azadiya Kurdistanê dibe. Arîn Mîrkan di nava hevalên xwe de bi rûkenî, dilnizmî û fedekarî dihat nasîn. Bi şoreşa Rojava re di sala 2012`an de û avabûna YPJ`ê di Nîsana 2013`an de, Arîn Mîrkan vedigere Rojavayê Kurdistanê û cihê xwe di nava YPJ`ê de digre. Di heman demê de, Arîn xwedî sekin û kesayeteke bi coş û moral bû. Herwiha di nava YPJ`ê de bi rengekî xwezayî rola fermandariyê dilîst û ji bona hevalên xwe çavkaniya hêvî û coşê bû. Arîn tevî sê birayên xwe beşdarî nava refên berxwedanê dibin û xwesteka wê jî ew bû ku her tim li hemberî dijmin di qada cengê de şer bike, lê dijmin nedizanî ku wê Arîn bi bedena xwe bibe pêtên agir û wan bişewtîne. Ev jiyana lehenga keça kurde, ev ne efsaneyeke ji xeyalê mirove, ev Arîn e, nasnameya kurd û Kurdistanê ye.

**Fermana hovan û lehengiya wêrekan**

Di 15`ê Îlona 2014`an de, çeteyên DAIŞ`ê ji 3`ê aliyan ve bi êrîşeke dijwar berê xwe dan bajarê Kobanê. Ji bo parastina Kobanê şervanên YPJ`ê, YPG`ê û gelê welatparêz li dijî êrîşan li ber xwe dan. Di şeva 5`ê cotmeha 2015`an de êrîşên çeteyan gihiştin Girê Miştenûr, ji ber Miştenûr cihekî stratejîk bû, çete bi hemû hêza xwe êrîş kirin û weke zebaniyên cehenemê bi ser bendên berxwedanê ve dihatin.



Piştî ku bendên berxwedanê dikevin qonaxa man û nemanê û tankên çeteyan dikevin nav çeperên hevalan, êdî fermandara mezin Arîn Mîrkan, fermana paşvekişînê dide hevalên xwe. Piştî ku hevalên wê, xwe bi paş ve dikişînin. Û guleyên çeka Arînê bi dawî dibin, êdî weke parêzvana rûmeta mirovahiyê, bi bedena xwe ya ku tije bombe kiriye, xwe bi çeteyên DAIŞ'ê û tankên wan de diteqîne.

**Arîn Mîrka sembol û efsaneya berxwedana Kobanê ye**

Arîn Mîrkan bi cesaret û vîneke xurt, ji bo parastina hevalên xwe û Kobanê çalakiya fedayî pêk anî. Bi vê çalakiyê re asta berxwedan û têkoşîna şervanên YPJ`ê digihîje lûtkeyê. Ev berxwedan û têkoşîn bi rizgarkirina Kobanê di 26`ê Çileya 2015`an de tacîdar dibe û YPJ`ê weke nasnameya tevahî jinên azadîxwaz hat pênasekirin. Çalakiya Rêheval Arîn Mîrkan, derbeyeke mezin li çeteyê DAIŞ'ê xist. Piştî vê çalakiya fedayî ya rêheval Arîn Mîrkan, êdî berxwedana Kobanê ket qonaxeke nû û bi sedan Arînên din, bedena xwe bi dijmin de teqandin.



# Avakirina sînema zindîhiştina bîranîna zarokên ku di komkujiyê de şewitîn

Ji bo bîranîna zarokên kurd ên ku di sînemeyayê de hatin şewtandin zindî bimîne, Komîna Film a Rojava, şaredariya gel ya bajarê Amûdê û bi destekdayîna hin saziyên civakî dest bi avakirina sînemayeke nû bi rûberê hezar û 162m² li bajarê Amûdê kir.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Komîna Film a Rojava bi destekdayîna hin saziyên civakî û alîkariya Yekîtiya Şaredariyan a Kantona Cizîrê ji bo bîranîna bi sedan zarokên kurd ên ku dema li Sînemaya Şehrazad a li bajarê Amûdê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li fîlm temaşe dikirin hatin şewtandin, zindî bê hiştin, dest bi avakirina sînemayekê nû ku wê weke navendeke çandî ya dewlemend be, kir. Herwiha Saziyên çand û hunerê yên li derveyî welat wekî diyarî ev proje pêşkêş kirine. Erka şaredariyê tenê pêkanîn e, beriya qebûlkirina avakirina sînemayê bi komîn, meclis û şaredariyê re nîqaş hatine pêşxistin û ev yek hate erêkirin.

**Bi agirê li bedena zarokan komkujiya reşa nîvê şevê pêk anîn**

Bûyera şewata sînemaya Şehrazad a li Amûdê, yek ji wan komkujiyên ku di bîra civaka kurd de, birîneke kûr vedaye. Di 13'yê Mijdara 1960'î de alîgirên rêjîma Baas'ê bi sedan zarokên kurd ên ji bajarê Amûdê ji bo temaşekirina fîlma "Reşa nîvê şevê" birin sînema Şehrazad. Di dema nîşandana fîlm de li salona sînemayê şewat derket. Di encama şewata gumanbar de zêdeyî 200 ku temenê wan 12 sal derbas nake, hatin kuştin. Komkujiya Sînema Şehrazad a bajarê Amûdê beriya 64 salan li Rojava pêk hat, mîna komkujiyên din ên li dijî gelê kurd hatine kirin, da ku her kurdan di qirkirinê re derbas bikin û wê carê qirkirina xwe li ser zarokên bê sûc û guneh pêk anîn, lê van xwînmijan xwe ji agirê sînemayê xelas kirin, lê kî wê wan ji agirê dojeh derxînin, ti carî agirê vê şewatê di dilê Rojava û dayikên wan pêşengan de venamire û ne tê jibîrkirin.

**Girîngiya sînema ji bo gelê kurd**

Sînama ji bo her civak û gelekî girîng e, bi taybetî jî, ji bo gelê kurd, ji ber ku sînema di nava civaka gelê kurd de, roleke girîng dilîst ku tê de ziman, dîrok, kultur, hebûn û hemû rengên jiyana xwe dîtin û nas kirin. Rewşenbîriya gelê kurd zêdetir bi şêweyê devokî hatiye belav kirin û veguhastin. Kulturê kurdan bi stiran û çîrokan ji nifşekî derbasî nifşekê din bûye û bi vî rengî belav bûye, heta ku hebûna xwe di demên zext û zordestan de parastiye. Dîroka gelê kurd kêm hatiye nivêsandin û yên dîroka kurdan nivêsiye jî zêdetir dîroknivêsên biyanî bûn. Di heman demê de, gelek pêgotin û serhatî yan jî stiran bi vegohastineka devokî di nav gelê kurd da mane. Sînema dîrok, cografî, wêje, ziman û gelek rengên jiyanê bi xwe ve digire. Herweha sînema dikarî kesayetiyên binavûdang yên ku bi çîrok û stiranan hatine naskirin bide nasandin. Zêdeyî huner, çand û



kulturê, sînemayê giringiya xwe heye di destnîşankirina rastiya ku li ser civakê tê kirin û dîtina çareseriyan di filman de. Gelê kurd xudan dîrokeka kevnar û kulturekê ciwanîn e.

**Bi peydakirina derfetan re wê sînema li her bajarî bê avakirin**

Bi şoreşa Rojava re, daxwaz û lêgerîna Komîna Fîlm a Rojava ji bo salonên sînema di her bajarî de bê avakirin, hebû, lê ji ber rewşên ewlehî, aborî, hem jî şert û mercên heyî, derfet nebû ku projeyên bi vî rengî ya salonekî sînema ava bikin. Lewra bi erêkirina vê projeyê re, di 31'ê Tebaxê de dest bi avakirina sîmayê li bajarê Amûdê hat kirin. Herwiha piştgiriya aborî ya projeyê ji aliyê dostên gelê kurd yên li Ewropa û heskerên sênema û demokrasiyê li cîhanê tê kirin û heta ku proje bê qedandin û salona sînema amede bibe, ev piştgirî wê berdewam bike. Herwiha sedema cihê avakirina sînema li bajarê Amûdê jî ewbû ku Amûdê di dîroka sînema de xwedî rolekî girînge, ji ber di sala 1960'î de bi 100'an zarokên kurd lê hatin şewtandin û ev şewat birîneke mezin di civakê de hişt û di dîroka sînema kurdî de jî bandorekî mezin kiriye, lewra ev ev proja li Amûdê dest pê kir û bi avakirina derfetan re wê li her bajarên Rojava salonên sînema bên avakirin. Di heman demê de temaşekirina fîlma bi kurdî bibe çand û bibe berçeyek rojane ya civakê.
Li gorî plansaziyê, rûbera sînemaya nû hezar û 162 metredam e û li başûrê bajarê Amûdê ye. Li gorî şaredariyê lêçûna wê 346 hezar û 326 dolar e. Berpirsên şaredariyê da zanîn ku çêkirina salona sînema dê di 6 mehan de bi dawî bibe. Herwiha li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji destpêka avakirina Rêveberiya Xweser ve, ev cara yekê ye saloneke sînemayê tê avakirin.

# Li Rojava şanoya şoreşgerî û Komîna Şano

**Ronî Ekîn**

Huner bi taybetî jî şano bi kîjan çandê tê kirin girîng e. Lewre çand teşeya jiyanê ye. Huner her dem jiyanekê dide xuyakirin û jîndarkirin. Hunermendê şanoyê eger hunera xwe bi cewhera çanda xwe bi cewherê hebûna xwe û bi cewherê ramanê xwe neke di bingeha wê de rastiya qirkirina çandî heye. Bi hezaran şanogerên me berendamên şanogeriyê bi sedan komên me û bi dehan lîstikên me tunebin wê gavê pirsgirêk di ruh û watedayînê de ye. Îro di dinyê de û di Rojhilata Navîn de qeyraneke kûr ya entelektuelî di hêla çandî de tê jiyîn ev rastiyeke. Ev qeyrana ku di hemû qadên civakê de tê jiyîn. Wekî her qadê di qada şanoyê de jî heta ku afireniya şoreşeke ramanî û kesayetî pêk neyê wê çareser nebe. Ev şoreş wê serdemeke jiyana demokratîk û azad veke. Ji ber vê jî şanoyê û şanoger ji bo xwe ji nû ve înşa û ava bike ji bo ji rewşa heyî derkeve pêdivî bi qasî nan û avê bi cihên ku di hundêrê wê de şano were nîqaşkirin bi komên tax û gundan bi dergehên şanoyê bi dibistan, akademî




û bi komînan heye.
Îro şoreşa Rojava wekî di her mijarê de pêşengtî kiriye di qada huner û şanoyê de jî pêşengtiyê dike. Îro em li rojava komîna şanoyê ava dikin. Hunera şoreşê ji bo şoreşa hunerê biafirîne xwe birêxistin bike xwe mezin dike û rêya xwe berdewam dike.
Jiyana komînê jî weke şanoyê behsa jiyana hevpar dike. Rengê komînê jî rêxistinkirina jiyana hevpar e. Komîn li hemberî dewlet û rejîman, jiyaneke rêxistinkirî li ser esasê azadî, wekhevî û demokrasiyê ye. Ji ber ku însan hebûnekî çandî û civakiye; ger însan ne çandî û cîvakî be, rastiya xwe winda dike. Çandbûn û civakbûn mijareke ramanî, felsefî, polîtîk, aborî û axlaqî ye. Însan bê civak, gelekî bê hêz û bê wate ye. Lê bi civakbûnê, bi rêxistinbûn û çandê gelekî afrîner û berhemdar dibe. Civak û çand weke bedenekî zîndî ye û her tim dijî.
Di roja me de 'Ezezîtî û Qirkirin' bi rengekî dijwar êrîşî civak û çandê dike. Wek nexweşiyekî belav dibe, civak û çand bê hêz û qels dike. Jiyana komîn û hevpar ancax bi rengê kom û komînê dikare rabe ser piya û çandeke civakî ava bike. Li ser vî esasê; komîn hem jiyaneke aborî ya hevpar, him jî di heman demê de demokrasî, exlaq û zihniyetekî azad a civakî û çandî ye. Komîn wateya coş û rêxistiniyê ye.

**Armanca Komîna Şanoya Rojava çibe?**

Bi çand û felsefeya demokrasiyê bi rengekî zanistî xebatê bimeşîne. Di aliyê perwerdehî, rêxistinî û pratîk de xebatên şanoyê bimeşîne û însanên bispor ava bike.
Komîn di xebatên xwe de, wê civakbûn û yekîtiya Kurda pêşdixe û çanda hevpar a netewa demokratîk saz bike. Komîn wê bi rêya şanoyê, şêwaza jiyana çandî û civakî geş bike. Qirkirina ku li ser axa Kurdistanê û Rojhilata Navîn tê meşandin ji hole rake û çanda gelan a demokratîk berfireh bike. Hunera şano di esasê xwe de çandeke demokratîk ava dike. Ji ber vê yekê Komîna Şanoyê, hunera şanoyê wek şewqdana jiyanê dibînê. Şano aynikê jiyanê ye û wek çalakiyeke azadiyê digire dest. Ji ber vê yekê Şano û kedkarê şanoyê wek hêzeke avakar rol digrin. Bi kesayeteke xurt, bi pêşxistina hunerê nefesê dide însana. Di şanoya xwe de her tim rastiya civakê esas digire. Komîna Şanoya Rojava bi taybet li Rojava pêşengtiya çanda şanoyê bike. Bi hunera şanoyê re bi rengekî bandor tevlî jiyanê bibe û bi pêşxistina çanda manewî hunermendên Rojava perwerde bike. Çanda demokratîk her tim biparêze û nasnameya çandî saz bike. Em dizanin ku azadiya civakê bi azadiya jinan re girêdayî ye. Jin çiqas azad be civak jî ewqas azad e. Ji ber vê yeke em wek komîna şanoyê ya Rojava pêşketina jina şanoger, wekî pêşketina cîvakê dibînin. Em bawer in ku di xebatên komîna me de jinên Kurd, wê bi awayekî herî xurt pêşengtiya şanoya Kurdî bike.



## Heyran Jaro

**Sîpan Şînda**

Heyran jaro, ez ê ji kulikê te mir im heeyyy, weeeyyy
Wey lê çavên min reş in kilê sibhanî nagir in.
Heçî dostikên vî heyamî ne, ji devê xwe ve dost in ji dilê xwe ve gawir in.
Ay lê heçî dostika wî başbe wey jaro, ay lê ji milk û emlak û bab û birakê wan şirîntir û çêtir in
Ay lê de bila Heyranê min sax be ay lê dostika wî ji vêre.
Kurdistan û bi taybetî ji herêma Botanê serkanîya dengbêjîyê û cureyên cuda yên miqamên giran e. Miqamên li Botanê têne gotin li çi herêmên din yên Kurdistanê nayêne gotin. Ji ber wê heta niha ji resenîya strana Kurdî ya li herêma Botanê tê gotin hatîye parastin û gelek xurt e. Mînak Payîzok, Bêlîte, Giranî, Serêlî, Xerîbî, Bûlik, Heyranok, Xizêmok, Lawik, û hwd. Yek ji strana Kurdî ya herî resen, navdar û kevin nabe jê strana Heyran e. Miqamê strana Heyran miqamekî giran û bi keyf e. Ji ber wê hemî dengbêj nikarine vê stranê bi miqamê wê yê resen bêjine. Miqamekî perda wê bilind e û gewî fetisînek e. Ji ber wê, bi taybetî jî ev stran û miqamê wê ji dengê gewriyê re gelekî giran e û dengê dengbêjan gelekî zû têxe. Ev miqam pitir li dengê mejî tê û dengbêjê ku dengê wî yê mejî be, bi rihetî dikare vî miqamî bêje.
Min ev stran ji gelek dengbêjan guhdarî kirîye. Lê belê yê ewilî min jê guhdarî kirî bê goman rehmetîyê bavê min bû. Dema em zarok, edetek ya bavê min hebû û çawa ew ji xewê radibû wî qîr dikirê û stran digotin. Bi taybetî ji strana Heyran, Sofî Birahîm, yan jî Bestik digotin. Sofî Birahîm jî bi miqamê Heyrano tê gotin û bi pirranî jî dema dengbêj strana Heyran dibêjin, Sofî Birahîm jî didîne ser. Hevalek yê bavê min hebû (niha jî sax e), dema dihat mala me, her tim bi hev re strana Heyrano digotin. Ewqas hez ji strana Heyrano dikirin ku wî hevalê bavê min navê kurê xwe yê mezin kirîye Heyran. Weke din çend dengbêjên hêl hene ku strana Heyrano bi miqamê wê yê resen dibêjine. Mînak Evdilayê Heyder, Ezdilezîzê Leşker, Ehmedê Elanê, Fadil Cizîrî û Îsivê Evdirehman çend dengbêjên ku strana Heyrano bi miqamê wê yê resen dibêjine û dengê wan lê tê, ji ber ku dengê wan yê mejî ye û nakeve. Jixwe dengbêjê keyfa wî lê bide her tim strana Heyrano dibêje, ji ber ku strana heyrano ne dilkule, berovajî wê bi keyf e û ji ber wê jî dema dengbêj wê dibêjine qet aciz nabine û zewqa wan her ku diçe zêde dibe.
Strana Heyran, straneke evîniyêye û bi awayekî duwetî hatiye hûnandin. Ango kurik û keçikê (Heyran û Mûmê) avêtine ser êkûdu. Bê goman ne ku kurik û keçik hatîne pêşberî hevdû rûniştine û gotine, ev jî hunerek ya dengbêja ye ku bi vî hawî gotine. Mînak Heyran banî dike û dibêje:
Ay lê keçikê li te keçînê
Ay lê te memik hêgên vê hêlînê
Ay lê mi go zozanê jûrî xweş in, de rabe ez û tu biçînê
Piştî vê gotinê keçik lê dizivirîne û dibêje:
Heyran jaro hege tu mazîçinî xwe ji nizaran bernede,
Ay lê hege tu bi heval û hogirî tu wê cabê li min nede
Ay lê hege tu bê heval û hogirî, tu were devê xwe bêxe xal û gerdenê, nava û singan û beran, bernede
Ay lê heta stêrka sibê derkeve, ay lê xwe bavêje aliyê qublet e
Strana Heyrano stranekî dirêje û her dengbêjê ku dibêje jî bendên cuda li ser vê zêde dike. Bi taybetî ji dema denbêj li hev dirûnin û bi hev re dibêjin, ew lê germ dibine û êdî nizanine bisekinin û wey welga wî yê bendekê li ser ve zêde bike. Lê ew her li gorî rîtma stranê dibêjine û ji resenîya wê dûr nakevine. Bê goman dema denbêj qîr dikinê, hecgo bendekê ji devê Mûmê û bendekê jî ji devê Heyranî bêjine. Di stranê de cih û deveran didine li ber hevdû û dijberiya deşt û zozanan, germayî û hûnikayî û gelek tiştên din bi awayekî hunerî û hostayî têne hûnandin. Di stranê de gelek sembol jî têne bikaranîn, jiyana civakî tête ristin û rewşa herdû evîndaran ya ketîn tête bi awayekî eşkere tête vegotin. Mînak:
De rabe keçikûkê cahêlê vê nanpêjê
De tu wê rabe nanî bipêje yekê bavêje li ser nîvê evê sêl ê
Ay lê de tu wê ji kul û mereqê Heyranîkê xwe ji, hey belê çavên xwe paqijke hêceta vê dûkêlê
Heyrano jaro tenîna Sindîya
Wey lê migo derdorê van reşkona spî dikin ji heramê van kevîya
Ay lê migo îro li min xweş tê dengê berxan, kalîna van mîya
Ay lê wez nizanim ne simbêlê Heyranê min sortirin ne qurmizê li ser lêvên keçikên van Cihûyan/Dihîyan.
Weke me li jorê ji anî ziman, strana Heyrano gelekî dirêje û di stranê de navê gelek cih û deverên herêma Botan û Behdîna têne gotin. Lê di stranê de dawî nîne ango encam ne dîyare ka çawa çêdibe û em nizanine ka Heyrano û Mûmê digihêne êkûdu yan na. Her wiha distranê de çi mirin û nexweşî ji nayêne vegotin. Belê her çend me Heyrano û Mûmê nedîtibin û em nebûne şahidê evîna wan jî, lê bi saya serê dengbêjên nemir hecgo me evînîya wan dîtî.

# Nagîhan Akarsel.. Rêwiya Heqîqetê

Jinên şopdarên rêya şehîd Nagîhan Akarsel diyar kirin ku ew ê li ser rêya heqîqeta xeyalên Nagîhan di pêşxistina zanista Jineolojî û serxistina şoreşa jinan de, pêk bînin.

**Jîn Hisên/Qamişlo**

Her jineke azad dibe hedefa hêzên desthilatdar, ji ber tê zanîn bi azadiya jinê desthilatdarî bi dawî dibe, ji ber vê yekê her dem sîstemên hakim û zihniyeta baviksalarî jinên pêşeng yên ji bo azadiya jinan û derxistina dîroka wê ya giran buha xebat dikin, dikin hedef. Bi hezaran jin hatin armanc kirin da ku îradeya jinan bê şikenandin, lê berovajî vîn û îrade xurtir dibe, her jineke azad û têkoşer tê hedef girtin, bi hezaran jin di rêya wan de dimeşin. Yek ji van jinan şehîd Nagîhan Akarsel e, jineke pêşeng û evîndara lêkolîn û derxistina heqîqetê bû, pêşxistina zanista Jineolojî û nasîna dîroka jinê ji xwe re xebateke giring dabû meşandin. Ji bo azadiya jinan têkoşîn kir û ji bo vê yekê bû hedefa  rêjîma desthilatdar û faşîzim dewleta Tirk ku berî du salan li Başûrê Kurdistanê hate hedefgirtin û gihaşt asta şehadetê. Nagihan Akarsel di sala 1976’an de li bajarokê (Golyazî) ya navçeya (Cîhanbeylî) li bajarê Konyayê ji dayîk bû. Navê gund bi kurdî Xelîkan e. Ji zarokatiya xwe ve pir jîr bû, bi zîrektiya xwe bal dikşand ser xwe. Dibistana seretayî, navîn û amadeyî li gundê xwe temam kir. Ji ber hezkirina wê ji lêpirsîn, lêkolîn û gerandinê, xwe di beşa raghandinê li zanîngeha Gazî ya Enqereyê tomar kir. Dema derbasî xwandina zanîngehê dibe, yekem car ji gundê xwe derdikeve û jê qut dibe. Di despêka zanîngehê de xwe ji sarbûn û materyalîzma jiyana bajêr dûr dixe û berê xwe dide cihên ku hîn jiyana xwezayî, jiyana komînal û hevaltî lê heye.



Bêrîvan Hesen



Lorîn Hisên Haj

**Bi lêkolînan gavên guhertinê di jiyana xwe de çêkir**

Nagîhan Akarsel di zanîngehê de bi zîrektî, dilpakiya xwe û hezkirina jiyanê dihat nasîn, yekem car Yekîtiya Ciwanên Kurdistanê nas dike û tevlî kar û xebatê wê dibe. Di heman demê de di zanîngehê de bi awayekî serkeftî berdewam dike. Piştî tevgera azadiyê nas dike lêkolînên berfirehtir dike. Dûrbûyîna ji cewher ji rastiya xwe tu carî dûr nediket ji ber vê yekê nedifikirî di nava pergala heyî de cihê xwe bigre. Her dem li pey têkoşînê digeriya, piştî têkoşîna gelê kurd nas kir ku li ser kîjan fikirî têkoşîn tê kirin, lêkolînên wê zêdetir bû. Piştî van lêkolînan cara yekemîn derbasî Şamê dibe li gel Rêber Abdullah Ocalan. Çûyîna Şamê gaveke yekemîn bû tevahî jiyana wê hate guhertin, gavek hişt ku zêdetir rêya têkoşîna xwe nas bike, û çawa têkoşîna xwe berdewam bike û li ser çi bingehî. Bi vî şêwazî çend rojên ku li gel Rêber Abdulah Ocalan dimîne ji bo xwe wekî xaleke guhertinê dibîne. Gavek ku guhertinên bingehîn di jiyana wê de çêkir.

**Ji ber kar û barên siyasî hate girtin**

Nagîhan Akarsel di salên 2001-2007’an de bi hinceta kar û barê siyasî tê girtin. Piştî ji girtîgehê derdikeve zanîngeha xwe berdewam dike û bi awayekî serkeftî zanîngehê temam dike. Di navbera salên 2008`an û 2014`an de li ajansa nûçeyan a Dîjle yê nûçegihantî û edîtortiyê dike. Di pêvajoya rojnamevantiyê de di heman demê de xebatê lêkolînê dikir, bi taybet lêkolînên girêdayî jinan. Piştî demekê di zanîngeha (Hecîtepe) dest bi xwendina lêkolîna ser jinan kir.

**Di kar û xebatên Akademiya Jineolojî de cih girt**

Ji ber hezkirina wê ji lêkolînkirina kar û xebatên jin di heman demê de Rêber Abdullah Ocalan giringî dida xebatên Jineolojî, tevlî Akadimiya Jineolijî dibe. Ji yekemîn kesên ku bû damezirînerên kovara Jineolojî. Ji bo zêdetir lêkolînên ser jinan çêbike sala 2016`an derbasî Rojavayê Kurdistanê bû, di heman demê de xebatên Jineolojî da meşandin.

Di sala 2017`an li Efrîn û 2018`an li Şengalê xebatên civaknasiyê dikir. Karîbû xwe bighêjîne hemû jinan, daxwaza naskirina her tiştî pê re hebû. Bi eşqekî mezin xebata xwe li Rojavayê Kurdistanê da meşandin û bê navber bedewam kir.

**Xebata dawî li Başûrê Kurdistanê**

Di çarçoveya kar û xebatên Jineolijî de sala sala 2019`an de derbasî Başûrê Kurdistanê bû, ji bo pêşxistina xebatên Jineolojî fêrî zaravayê Soranî bû. Li Başûrê Kurdistanê bi dehan perwerde û semîner ser Jineolojî da. Bi kelecan ji bo avakirina (Pirtûkxane, Arşîv û Navenda Lêkolînên jinên Kurd) xebatek da meşandin. Pêwistiya vê pêvajoyê hîs kir da ku cihekî jinan hebe tê de nefes bigrin û rastiya jinê tê de bê parastin û lêkolînkirin. Cihekî tê de jin xwe nas bike û dîroka xwe zanibe, ji bo vê yekê ev proje weke pêwstiyek dît û da destpêkir.

Nagîhan Akarsel di 4`ê Cotmeha 2022`an de, ji hêla Istixbarata Tirk ve hate şehîd xistin.

Derbarê salvegera Şehadeta Nagîhan Arkasel de, endamên Akademiya Jineolojî Bêrîvan Hesen û Lorîn Hisên ji  ji rojnameya me re axivîn.

Bêrîvan Hesen di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Meyzekirina Nagîhan Akarsel ji jiyanê re bi eşq bû û li her tiştî wiha meyze dikir. Beriya ku dest bi çi karî bike eşq û heycana xwe dixist nava xebatan de û bi vî rengî berdewam dikir. Dema wê dest bi çi xebatê dikir, serkeftin ji xwe re esas digirt.”



**‘Kesayetek afrîner û xwedî bandor bû’**

Bêrîvan Hesen îşaret kir ku her jineke pê re rûdinişt an beşdarî semîner û prwerdeyê wê dibû, bandoreke pir mezin di wan de ava dikir, ne tenê di axaftinên wê de, lê di jiyan, şêwaz û heycana wê de, di lêkolîn û nivîsên ku dinivîsand û wiha pê de çû: “Heval Nagîhan Akarsel ji bo bighêje rastiyekê lêkolîn, xwendin û lêpirsînên kur dikir. Her dem digot eger mirov bixweaze dikare bighêje her tiştî. Ji ber ku pir zêde bi jiyanê û heqîqetê re girêdayî bû li pey heqîqetê digeriya, ev sekina wê banoreke mezin dida avakirin.”

**‘Rastiyên veşartî derdixist holê’**

Bêrîvan Hesen axaftina xwe wiha qedand: “Jineke lêkokînvan û rêwiya heqîqetê bû, bê navber ji bo hişyarkirin û zanekirina jinan, ji bo rastiya jinê ronî bike li peyê vê yekê gelek xebat da meşandin, ev yek ji bo rêjîmên detshilatdar û hêzên hakim tirseke mezin dide avakirin, yek ji sedemên hedefgirtina wê bû, ji ber ku cihê lê beşdar dibû pir bandor lê dihat kirin. Rastiyên veşartî derdixist holê. Ji bo zihniyeta baviksalar tehdîdek bû. Jineke pêşeng û têkoşer bû. Di riya heqîqetê dimeşiya. Bandora şehadeta wê li ser her jineke ku bi heval Nagîhan re rûniştibû hebû. Bandoreke mezin da çêkirin, ev bandor hişt ku her jinek wê naskiriye soza şopandina xeta wê berdewam bike, rêya ku nîvco ma temam bikin û xeyalên wê pêk bînin. Windahiyeke pir mezin bû ji bo têkoşîna azadiyê.”

Lorîn Hisên jî di derbarê şehîd Nagîhan Akaresel de wiha got: “Du sal derbas dibe ser şehadeta Nagîhan Akaresel, tevî ku min heval Nagîhan nedîtiye lê dema behsa wê dikin, di şexsê şehîd Nagîhan de min jinek têkoşer û xwedî îrade dît, jineke mîna teyrekî li asîman li azadiyê digeriya. Her dem li aramî û hezkirina jiyanê digeriya. Yek ji xeyalên şehîd Nagîhan ew bû ku romanekê li ser jiyana xwe û naskirina wê ji fikir û felsefeya rêber Apo re binvîsîne, lê mixabin ev xeyal pêk nehet ji ber hedefgirtina wê ji hêla Mît`ên delweta Tirk a faşîzim gihaşt asta şehadetê.”

**‘Her dem li heqîqetê digeriya’**

Bêrîvan Hesen di dawî wiha anî ziman: “Jineke bi vî rengî ku ji jiyanê û azadiyê hez dike, tevî hemû zehmetî û êşan li heqîqetê digeriya, ev şewqa wê her dem di nava dilê her jinekê bimîne. Her dem bi drûşmeya Jin, Jiyan, Azadî têkoşîna xwe berdewam dikir. Dema jin azad dibe desthilatdarî nameîne, jinên pêşeng yên ku her dem tê hedefgirtin bi sedema qirêjiya zihniyeta baviksalarî ye, ku em weke jin bi hezarên salan li dijî vê yekê têkoşîn dikin. Şehîd Nagîhan Akarsel yek ji jinên ji bo azadiyê têdikoşiya û armanca wê azadiya hemû jinan bû ji ber vê yekê hate hedefgirtin. Em ê li ser rêya wê berdewam bikin û zanista Jineolojî û azadiya jinan bikin armanca jiyan xwe.”

## Şerê tunekirinê bi navê Olan



**Hafiz Ahmet Turhalli**

Pirsgirêka Rojhelata Navîn bûye pirsgirêka sereke ya Cîhanê.

Herdû hêzên ku şer derdixin û dibin sedemên aloziyên mezin, îradeya bihevre jiyanê pîştguh dikin, Hêzên weke Hamas, Hizbullah û piştgirên wan Tirkiye, Îran û desthelatdarên dên yên qaşo oldarin.

Ev hêzên han ji bo desthelata xwe mayinde bikin, propaganda tunekirina cuhiyan li rûyê erdê, bi navê Îslamê dikin. Weke kû Îslam tu ol, bîr û baweriyên dîtir napijirîne, pênase dikin. Ji bo alîgirên desthelata xwe zêde bikin, hemuyan ji holê rabikin, xwe û alîgirên xwe li ser tunekirin û qirkirinan sor dikin. Gelo ev nêzikbûn û nirxandinên dewletên desthelatdar binavê Îslamê pêktînin, çiqas li gor pîvanên Îslamê ne? Ger pîvanên Îslamê Qur’ana pîroz û suneta Pêxember bin, divê ev pîvan werin vegotin!

„Ger Xweda bixwesta, ew ê li rûyê erdê hemû kesan bawerî bi (Îslamê) bi aniya. Ger Rewş ev be; tu yê çawa bidarê zorê mirovan bikşînî nava baweriyê.“ (Yûnus 99)

Li gor wateya vê ayeta han, Pêxemer jî tê de, tu kesekî nikare baweriya xwe li ser mirovan bi darê zorê ferz bike. Lewra xwedê rexne li Hz Mihemed sXl dike û dibêje; tu nikarî ji bo bawerîanîna mirovan zorê li wan bikî!

Ger heqîqet û fermana Qur’anê bi vê rengî be; kesê/kesa bawerî bi ola Îslamê anîbe, çawa kare zext û zorê li ser bicîhkirina baweriyê wek şêwaz bikar bîne?

„Qur’an a pîroz dibêje kuştina mirovekî bi neheqî, weke kuştina mirovahîyê ye!“ (Maîde 32)

Kê kare bêje Îslamê cewaz daye ku ji ber baweriya mirovan cudaye, anjî ne Îslame, divê ew mirov werin kuştin?

Di Pîvanên Îslamê de tenê parastina rewa heye. Êrîş bi navê xwedê û ol nayên kirin.

Weke di sureyek biçuk ku navê wê sureya Kafîrûne weha tê gotin: “Ola we ji were û ya min jî jimen re.” (Kafîrun 6), pîvan jî ew ayeta bi xwe ye.

Îro kesên navê Îslamê li xwe kirine û behsa Îslamê dikin, dibêjin divê em cuhiyan bi yek carî tune bikin! Ev nêzikbûn nahêlin ku pirsgirêk bi guftugo û dîyalogan werin çareser kirin.

Bi navê ola Cuhitiyê jî îro, Natenyahu û henekî cuh jî dibêjin ger em Misilmanan tune bikin. Ji ber wê propaganda berfirehkirina axê dikin û dixwazin Misilmanan ên li derûdorên wan dijîn tune bikin. Bi vê polîtikaya şaş û olperestiya tund li çareseriyan digerin. Bi navê cuhutiyê kuştinê û qirkirinê pêk tînin. Ev hişmendiya bi navê Cuhitiyê nahêle ku jibo pirsgirêkan çareseryên mayinde werin bicîh kirin.

Tewrat weha dibêje:
Bê Xweda ji kesî re îbadet neke
Navê Xwedê bê sedem û vala bikar neyne
Ji dê û Bavê xwe re rêzê bigre
Nekuje
Zînayê neke
Diziyê neke
Şahidiya bi derew neke
Çavê xwe bera namûsa cîranê xwe nede
Çav bera xanî, eşya û hebûna cîranê xwe ne de

Fermanên ku Tewrat behsa wan dike, heman ferman di Qur’ana pîrozde jî tên dubarekirin.

Lê mixabin ev herdû alîyên ku dibêjin em oldarin, jibo desthelatên xwe alîgirên xwe ji rê derdixin û wanan gellekî xirab bikar tînin. Îro di Rojhelata Navîn de mirov bi navê Îslam û cuhîtiyê hevdû tune dikin. Ev karên tên kirin ev xirabiyên tên kirin tu têkiliya wan bi Olan nîne. Ev leyistikên desthelatdarane! Divê em xwe jivan nebaşiyan dur bixin û rêya sêyem bidomînin.



# ‘Herêm ber bi  şer û pêvajoyên girantir ve diçe’


Rojnamevan Erdogan Altan da zanîn ku Hamas bi êrîşa xwe ya dawî ya li dijî Israîlê perçiqî û nedikaribû wê êrîşê veguherîne qezanckirineke siyasî an jî civakî û wiha got: “Ji niha û şûnde wê herêm hin şer û pêvajoyên girantir bijî. Bila ti kes Îsraîl ji bo cihûyan weke parazvanekê nebîne. Lê belê ew nûnera hêzên kaptalîzm li herêmê ye.”

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Geşedanên dawî yên ku li herêma Rojhilata Navîn bi taybet li Israîl, Filestîn, Libnan û derdorê çêdibin, cihê xeterî, rapirsîn û hizirînê ye. Girêdayî heman mirjarê rojnamevan Erdogan Altan, bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Di dema heyî de sedema şer û pevçûnên ku di navbera Israyîl, Hizbullah û Hemasê de çêdibin çi ye?**

Geşedan û pêşketinên dawî yên ku herêmê aniye ber gilokek ji agir, teyisandin an jî eynika şerê cîhanî yê siyem e. Yek ji sedemên bingehîn ên sêyemîn şerê cîhanê ew e ku îştaha hin hêzên gerdûnî (Rusya û Çîn) û hêzên statukoparêz (Tirkiye û Îran) dixwazin bikevin cihê hegemonya Amerîkayê, vedike. Rewşa heyî wiha ye; Tirkiye û Îran difikirin ku Dewletên Yekbûnyê yên Amerîka (DYA) di Rojhilata Navîn de lawaz ketiye. Ji bo vê jî cihên (Iraq û Sûriye) ku wê DYA vala bike tije bikin û cihê vala bike jî ew bixwe mudaxele bikin. Ji ber ku dema Amerîka ji Afxanîstanê vekişiya ji aliyekê ve Çîn di bin navê aborî û teknîkê de, di heremên Şîa de jî Îran û hin heremên din jî dewleta Tirk a dagirker xwest destwerdanê bikin. Niha tê nîqaşkirin ku wê DYA ji Iraq vekişe, Tirkiye û Îran dixwazin mudaxeleyê wir bikin. Ji xwe ne hewceye em qala Sûriyê bikin, ji ber ku ji bo wan cihê herî sereke ya mudaxeleyê Sûriye ye. Anku her kes ya hev çavdêrî dike û li gor wê qaxeza xwe ya destwerdanê amade dike. Divê em şerê navbêra Îsraîl-Hemas û Îsraîl-Hizbûllah jî di vê çerçoveyî de bigirin dest. Yanî Tirkiye û Îran ku hewil didin valatiyên ji ber hegemonya DYA’yê çêbûne tije bikin, Îsraîl û hin hêzên din ên heremî (wek e Suîdî Erebîstan, Misir û Hîndîstan) jî nasekinin. Ew jî hem dixwazin pêşiya van her du hêzên heremî yên Tirkiye û Îranê ku dixwazin cihên valatî ava bûne tije bikin, bigirin û hem jî dixwazin ew bibin hêzên sereke yên van valatiyan tije bikin. Ango ji aliyekî ve dixwazin ji hegemonya DYA’yê re kontrol bikin, çareser bikin.



**Di şerê heyî de nakokî û îtîfaqa hêzên navdewletî û heremî çawa ye?**

Di stratejiya ewlekariya neteweyî ya Amerîka de hertim parastin û palpiştevaniya Îsraîl heye. Ev rast e, lê Îsraîl jî gelek caran înisiyatîf girtiye û serdestiya Amerîkayê ya lawaz bûye li ser navê wê ji nû ve ava kiriye û piştgiriyeke xûrt daye wê. Hamas nûnerê xeta Îxwanî (Birayên Misliman) ên radîkal a îslama Sunî ye. Ji aliyê hikumeta şer a AKP/ Erdogan ve hatiye parastin, xistiye bin baskê xwe. Ev parastin carcaran derketiye asta têkiliyên stratejîk jî. Hîzbullah, nûnertiya baskê herî radîkal a îdeolojiya Şîa dike. Hêza xwe ya îdeolojîk ji xeta Ayetulah Xumeynî û bajarê Kûm a ku navenda îdeolojiya Şîa ye, digire. Piştgiriya xwe ya siyasî û ekonomîkê jî ji mêj ve ji Komara Îslam a Îranê digire. Hizbullah vê destekê digire jî li Lubnanê zivirandiye piştgiriyeke cidî ya civakî. Lê ji ber berjewendiyên wan ên hevpar ji bo Îran bibe hêzeke serwer a heremî jî têkoşînek û siyaseteke xurt jî meşandiye. Di vir de derdikeve holê ku Hizbullah di ser Îran, Hamas jî di eksen û desteka Tirkiyê de sekineke stratejik-polîtîk nîşan dane. Ango Tirkiye û Îran van her du hêzan li ser esasê berjewendiyên xwe yên heremî aktîf kirine an jî xistine tevgerê. Em vê rewşî wisa jî dikarin bixwînin; şer û pêvçûna navbêra Hamas û Hizbûllah a li dijî Îsraîlê, di esasê xwe de Îran û Îsraîl hatine beranberê hev û qismek jî dewleta Tirkiyeya Erdogan û dewleta Îsraîl a Netenyahu nakokî û pêvçûnê de ne. Mijar, mijareke hewildana her yek dibêje ez bibim serwer (hegemonya) heremê ye, lêgerîna serwerbûyîna heremê ye. Bi taybet dewleta Tirk a dagirker ku di bin navê ‘xwedî li doza Filîstînê derdikevim de’ ewqas qîr û gazin dike, sedema xwe ew e ku dixwaze bide ferqkirin ku ew rant (para min jî heye) heremî taleb dike. Ev vekirî û zelal xuya dike ku DYA, Brîtanya, Fransa, Elmanya, di vê şerî de di hêla ekonomî, leşkerî, siyasî û dîplomasiyê de piştgiriyê didin Îsraîlê, her cure alîkarî dinin û bi vî awayî dibin terafek (aliyekê) vê şerî.

**Wê rewş û pozîsyona Îran, Hamas, Hizbullah ji niha û şûn de çi be?**

Em dikarin bêjin ku Hizbullah ji salek û şûnde pozîsyona xwe ya li dijî Îsraîlê baş zelal nekir an jî nikaribûye diyar bike. Yanî heya kîjan radeyî piştgiriyê bide Hamasê an jî berxwedana Filistîne aşkere nekir. Di vê mijarê de xwarûvîçkên cidî jiyan kir. Hizbûllah hemû nakokiyên mezhebî yên bi Hamas re di stratejiya xwe ya siyaset û leşkerî de teyîsand. Tenê di hemû çalakiyên Hamasê ji ber dijbertiya Îsraîlê dikir xwest jê sûd werbigire, lê sekineke ku dixwaze di vî şerî de Hamas bi ser bikeve nîşan neda. Bêguman dizanîbû ku eger Hamas tasfiye bibe wê dor were wê. Ji bo vê jî piştgiriya xwe tenê di asta ku Hamas tam tasfiye nebe de hişt. Yanî nexwest Hamas tam tasfiye bibe. Ev sekina ne diyar a Hizbûllahê çavkaniya xwe ji siyaseta Îranê digire. Îran jî di vê pêvajoyê de siyaseta xwe wek “Stratejiye Sebir-sebirkirinê” pênase dike. Ez bawerim Îran vê siyasetî li ser gotinên pêşiyan a “Derwêşê sebir bike digihêje miradê xwe” xwestiye ava bike. Rast e ev siyaseta Îranê di Iraqê de encamek girt. Lê divê Îran baş zanibe di demên dawî de civaka Rojhilata Navîn vê gotinê wiha zivirandine “Derwêşê pir sabir bike ji sebrê qelihiyemiriye çûye”. Ango geşedanên dawî ya Îsraîl-Hizbûllah rewşa siyaseta Îran a “Stratejiya Sebir-Sebirkirinê” dişibe rewşa gotina duyemîn a ku civakê zivirandiye. Hamas jî, di bin mezinbûna êrişa xwe ya ser Îsraîlê de perçiqî. Ne dikaribû wê bersivdayîna Îsraîlê pêşwazî bike, ne jî dikaribû wê êrişa xwe bizivrîne qezanckirina siyasî û civakî. Ji xwe nikaribû bersiva êrişên Îsraîl ên bêwjdanî hatin kirin bide. Di bin navê agirbestê de hevdîtinên hatî kirin jî tenê ji bo hin wext qezanc bike an jî bixapîne. Ev yek bi sûîqasta li serokê Hemasê Îsmaîl Hanî hate kirin de, derket holê. Bêguman ji niha û şûnde wê herêm hin şer û pêvajoyên girantir bijî. Dibe ku hêza Hemas û Hizbûllahê lawaz bûbe, lê çand û kevneşopiya Rojhilata Navîn li dijî her cure êrîş û ferzkirinên derve berxwedaniya xwe bidomîne. Vê berxwedaniyê êdî di bin kîjan nav an jî navan de bike qiymeta xwe nîne, lê dê berdewam bike. Bila ti kes ya Îsraîlê jî bi boneya cihûyan weke parazvanekê nebîne. Lewra Îsraîl nûnerê heremê ya hêzên emperyal ên gerdûnî ye. Notirvanê sereke ya sermayedarên gerdûnî ya Rojhilata Navîn e. Stratejiya wê ya bingehîn êrişkariya wê ye. Dewleteke ku êrişkariya xwe zivirandiye xeteke polîtîk.  Du êrişkarên hov ên Rojhilata Navîn hene; yek Îsraîl e û yek jî Tirkiye ye û hertim êrişî nirxên civakan dikin.



**Hetanî ku aramî bikeve herêmê, pê re jî alozî û pirsgirêkên heyî li Rojhilata Navîn çareser bibin, pêwîste çi were kirin?**

Pirsgirêka bingehîn a heremî netewdewlet e. Ji ber vê yekê di hemû pirsgirêkên Rojhilata Navîn de dest û para netewdewlet a Îsraîl, netew dewlet a Îranê, netewdewlet a Tirkiyê tê de heye. Yek ji wan Şîacitiyê dike, yek ji wan Sûneîyê dike, yê din jî siyonîstkariyê dike. Ji bo vê jî hewil didin li ser her kesan ferz bikin ku li gorî wê pozîsyon bigirin. Naxwazin parve bikin, hevkariyê bikin, dixwazin bi zor û zordariyê her tiştî ji xwe re bigirin, serdestiya xwe ya netewdewletbûnê ferz dikin. Gelek hêzên biçûk û mezin ên heremê li gorî berjewendiyên xwe bi kar tînin. Taybetmendiya herî bingehîn a van her sê dewletan ew e ku an terafekê şerên diqewimin, an jî krîz û kaosan derdixin û jê sûd werdigirin. Hemû nêt û hewildanên wan ew e ku li her derî bila krîz û pêvçûn derkeve û ew jî ji vê sûd werbigirin, e. Bi taybet hikumeta şer a faşîst a Erdogan mîmar û pêşengê wê ye. Ji bo vê jî weke çareserî jî divê li her derî pergala konfederal were farzkirin. Ev pergal wê pirsgirêkên Lubnan, Lîbiya, Iraq, Sûriye û hwd… çareser bike. Ji bo vê jî guhertin û veguhertina van dewletan mereke esas e. Bila Îsraîl jî nebêje min serokên Hamasê û Hizbûllahê kuşt û min wan lawaz kiriye û nekeve kêfxweşiya serkeftinê. Ji ber ku bi vî awayî dê ew jî bi aram û rehat nebe. Lewra di çanda Rojhilata Navîn de her tim berxwedanî heye û wê berdewam be. Tirkiye jî bi vê feraseta netew dewlet a hişk nikare berdewam bike, deriziye. Di hêla aborî de hildiweşe. Xeta êrişkariya wê ya leşkerî li hemberî berxwedana Gerîlayên Azadiyê bi ti awayî serkeftina dixwaze bidest nexistiye, berevajê wê xitimî ye. Di hêla dîplomatîk de tenê dimîne. Di siyaseta navxweyî de pêvçûn û nakokiyeke desthiladariya piralî ve diçe. Ango her kes dixwaze bibe desthiladar. Şêwaza qetilkirina keçika bi navê Narîn û hewildana dixwazin ser bûyerê bigirin, nîşaneya dewleta hildiweşe, civaka ku tengijî ye, exleqên ku pûç û vala bûne ye nîşan dide. Êdî qet deng ji dewlet Baxçelî yê ku digot parastina Enqereyê di destxistina Kerkûk, Mûsil û Şamê de derbas dibe, dernakeve. Tirkiye ji her pêşketin û guherandinan re di pozîsyona avis de ye. Îran, bi yek hevokekê hesaba wê kengê mudaxeleya hûndirê wê were kirin dike, li benda dora xwe ye. Hemû siyaseta xwe li ser dema vê mudaxeleyî dirêj bike ava dike. Komara Îslam a Îranê divê vê yekî baş zanibe, tu feydeya tirsê ji ecelê re tune. Êdî nikare parçe parçeyan bide û welatê xwe biparêze. Eger karibûya bi vê siyasetê xwe biparêze wê Sowyetan xwe parastibûya. Yanî eger em vê pêşdîtinê bînin ziman wê ne şaş be; ji niha û şûnde dora Haşd Elşaibî ye û Hûsiyan e, bi şiklekê din jî dor were hikumeta Şamê ye.

# Kobanê ne ket, Serket...(2)

**Argêş Gewda/Qamişlo**

Peyama Rêber Abdullah Ocalan û Sekna berxwêder ya Gelê Kurd Serhildana mezin di roj li pişt xwe hiştibû. Di gel qedexeyên kolanan, tang û topan û çeteyên AKP'ê jî gelê Kurd bi paş ve gav nediavêt. Serhildan di 8'ê Cotmehê de jî berdewam dikir.

Li bajarên Amed, Mûş, Êlih, Dîlok, Riha, Sêrt, Mêrdîn, Çewlig, Stenbol, Îzmîr û Edeneyê çalakiyên gel berdewam dikirin. Êdî li hin deveran polîsên AKP'ê xwe ji qada vekişandibûn û cihê xwe ji çeteyan re hiştibûn. Çeteyên alîgirê DAÎŞ'ê li gelek deveran bi çekan êrîş dibirin ser gel. Li hin bajaran jî polîsan bi çekan çalakvanan gullebaran dikirin.

Li navçeya Nisêbînê ya Mêrdînê bi sedan welatiyê ku daketin qadan bi polîsan re ketin nav pevçûnan. Di pevçûnan de zarokê 12 salî yê bi navê, Ozgur Daş bi bombeya gazê ya polîsan bi giranî birandar bû. Dîsa li navçeya Qoser a Mêrdînê di 8'ê Cotmehê de li taxa Îpekê cenazeye du sivîlên bi navê Ferhad Îbrahîm Elduveric û Abdullah Muhammet Latîf hat dîtin.

Li Batmanê jî bi destpêka 8'ê Cotmehê ve leşkerên artêşa Tirk yên dagirker li tax û kolanên bajêr hatin bicihkirin. Li gel qedexeya walîtiyê jî welatî ji serhildanê gav paşve neavêtin. Di pevçûnên ku di navbera gel û çeteyên Erdogan de qewîmîn, welatiyê bi navê Emre Demîr ji aliye hêzên Hîzbûlkontra ve hat qetilkirin.

Di 8'ê Cotmehê de herêma serhedê jî serhildanên xwe domandin. Li Wanê li ser êrîşa polîsan a li dijî termê Hamdî Caner ê di 7'ê heftê Cotmehê de hatibû qetilkirin, di navbera hêzên dewletê û gel de pevçûn derketin. Di van pevçûnan de çeteyên Hudaparê li rex polîsan êrîşê welatiyan kir. Di pevçûnan de 2 jê giran 10 kes birîndar bûn. Li gel Wanê li bajarên Colemêrg, Bedlîs, Mûş, Sêrt, Agiriyê jî serhildan berdewam kirin.

Agirê serhildanê li Botanê di roja sêyemîn a serhildanê de jî her ku diçû berbelav dibû. Bi taybetî li navçeya Cizîra Şirnexê welatiyên ku daketin qadan bi rojan li taxên wekî cûdî, Nûr, Yefes, Îdîl û Orhan Dogan bi hêzên paramîlîter ên Erdogan re ketin nav şer û pevçûnan. Di encama şer de gelek kes birîndar bûn. Zaroka 5 salî






Elîf Udal bi wesayîta zirxî û zarokê 8 salî Harun Benzer jî bu fişeka polîsan birîndar bûn.

Li Amedê pevçûnên k udi 6'ê Cotmehê de destpêkirin di 8'ê cotmehê de jî heta dawiya rojê dewam kirin. Însayatifa Gel a Kurdistanê û Kongreya Civaka Demokratîk bi daxuyaniyên ku dan diyar kirin ku "dive gel ji bo piştgiriya Kobanê û Rojava xwe ji qadên têkoşînê paşve nekşîne" Ev daxuyanî bi berxwedanên gel bersiv didîtin.

Serhildanên ji bo piştgiriya Kobanê piştî 8'ê Cotmehê jî dewam kirin. Di vê pêvajoyê de pêkanînên deweleta Tirk rûyê tarî yê Erdogan aşkare kir. Erdoganê ku li hember serhildanê gel ket tengasiyê, rêya çareseriyê di êrîşên paramîlîter û hîzbûlkontrayê de dît. Lê ev yek li hember serhildanên gel têk çû.

Di pêvajoya ku serhildanên ji bo kobanê dewam dikir de, hevserokê giştî yê HDP'ê Selehattîn Demîrtaş di daxuyaniyeke li Amedê ya di 9'ê Cotmehê de diyar kir ku ew bi Rêberê Gelê Kurd Abullah Ocalan re ketine nav têkiliyê. Rêber Abdullah Ocalan bangawazîyek dûalî ji bona gel û desthilatiya AKP'ê kir. Ev banga Ocalan bandor li gel kir. Gelê kurd bi hêzên xwe yên siyasî ve ragihand ku heke ji aliyê hikumetê ve gav bê avêtên dê ew jî amade bin ji aramiyê re.

Di serhildana 6-7-8'ê Cotmehê de bi taybetî li Bakurê Kurdistanê di pevçûnan ku qewimîn de bîlançoyên giran derketin holê. Encamên lêkolînên Komeleya Mafên Mirovan ên di derbarê serhildanên Kobanê de giraniya bîlançoyê raxist ber çavan. Rapora komeleya mafê Mirovan bi vî rengî bû.

**Bîlaçoya ÎHD'ê a serhildanên Kobanê**

-46 kesan jiyana xwe ji dest da
-682 kes birîndar bûn (herî kêm 110 ji wan zarok)
-1974 kes hatin binçavkirin
-323 kes hatin girtin
-38 kes rastî îşkenceyên giran hatin

Serhildanên gel ên ji bo Kobanê di bingeha rizgarkirina Kobanê de bû yek ji hîmê bingehîn. Li aliyekê berxwedanên gel ên li Kurdistan û cîhanê, li aliye din têkoşîna di eniyên şer ên li hember çeteyên DAÎŞ'ê bi xwe re mizginiya rizgariyê anî. Ev mizgînî di meha Çileya 2015'an de bi agahiya "Tevahiya Kobanê ji çeteyan rizgar bû" hat dayîn.

**Doza Kobanê Û hewildanên tolhildanê ya Dewleta AKP'ê**

Kobanê rizgar bibû, ew DAÎŞ'ê ku li Rojhilata Navîn wek pizota agir bibû belayê serê gelan, bi berxwedana keç û xortên Kurd têkçûbû. Kobanê bibû destpêka têkçûyîna DAÎŞ'ê li tevahiya Sûrî û Rojhilata Navîn. Tevahiya welatên cîhanê minekarê lehengên Kurdistanê bûn. Li çanekarê cîhanê serkeftina hêzên YPG û YPJ'ê dihate axaftin. Cîhan matmayî mabû li vê îrade û berxwedanê.
Lê belê hin kes hebûn ku ev serkeftin bibû kul û derd ji bo wan. Di serî şefê faşist Erdoğan û hevkarên xwe vê têkçûyîna DAÎŞ'ê weke têkçûyîna polîtîkayên xwe didîtin. Lewma hem li Bakurê Kurdistanê, hem li Başur, hem jî li Rojava êrîşên xwe yê dagirkirinê berfireh kirin.


Dema ku berxwedana Kobanê û serhildanên ji bo piştgiriya Kobanê pek hatin pêvajoya çareseriyê hê jî berdewam dikir. Her çiqas di pişt perdê de dewleta AKP'ê ji bo têkbirina têkoşîna rizrgariya gelê Kurd bi planên weke "çok dayînê" planên qirêj saz dikir jî, pêvajo hêj nexetimî bû. Ji ber vê yekê bûyer û qetlîamên ku di sê rojên Cotmeha 2014'an de pêk hatin ji rojevê hat xistin.
Wê demê serdozgeriya Amedê di derbarê bûyeran de lêpirsînek da destpêkirin lê tiştek ji vê lêpirsînê derneket. Paşî di Cotmeha 2015'an de careke din lêpirsînek di derbarê rêveberên navendî yê HDP'ê de hate destpêkirin. Ev lêpirsîn demeke dirêj berdewam kir.

Lêpirsîna di derbarê bûyerên serhildana Kobanê de ku mijara dosyaya me ye, di Îlona 2020'an de hate vekirin. Di 25'ê îlonê de li gelek bajaran operasyonên binçavkirênê hate kirin û 20 HDP'yiyên ku di nav de şaredar û parlamenterên berê jî hebûn hatin binçav kirin. Serdozgeriya Enqereyê di derbarê 82 kesan de biryara binçavkirê dabû. Piştî wê rojê dem dem hin HDP'yiyên din jî hatin binçavkirin. Di 2'yê Cotmehê de ji kesên hatibûn binçavkirin 17 kes hatin girtin. Di 3'yê Mijdarê de jî 3 HDP'yiyên din hatin girtin. Û her wiha di derbarê siyasetmedarên ku berê ji ber hin dozên din di zindanê de bûn jî li ser vê lêpirsînê biryara careke din girtinê hat dayîn.

Doznameya vê lêpirsînê di Kanûna 2020'an de temam bû û 22'yemîn Dadgeha Cezayê Giran a Enqereyê di 7'ê Çileya 2021'an de dozê qebûlkir. Doznameya ku bi tevahî li ser derewan hatibû sazkirin ji 3 hezar û 530 rûpelan pêk dihat. Her wiha 324 klasorên delîl û pêvekan hebû. Dozname ji bo 108 siyasetmedaran hatibû amade kirin û 28 ji wan hêjî girtîbûn. Di nav wan de Hevserokên Giştî yê HDP'ê yên berê Selahattin Demirtaş û Fîgen Yuksekdag, siyasetmedarên weke Gultan Kişanak, Sebahat Tuncel, Sırrı Sureyya Onder, Ayla Akat Ata jî hebûn.
Di doznamê de di derbarê siyasetmedaran de ji 29 sucan 38 car cezayê muebbede û 19 hezar û 680 sal cezayê zindanê dihat xwestin.

Ev doza dewleta AKP'ê û daraza wê li dijî siyaseta Kurd, bi hêrsa têkçûyîna Kobanê hatibû pêk anîn. Ev yek di amadekirina doznameyê de jî xwe dida xûyakirin. Lê doza Kobanê rastî bertekên gelek aliyan hatin. Ji xwe dema roja yekem rûniştina dadgehê nêzik bû, doz hêdî hêdî vegeriya darizandina AKP-MHP û polîtîkayên wan yê înkar û îmhayê. Ji xwe ji ber van sedeman bû ku daraza AKP'ê nexwest dadgeheke bi rêk û pêk çê be û yekem rûniştina dozê sabote kir.

Di van rojan de ev doza girîng hê jî berdewam dike lê wisa xwûya ye wê siyaseta Kurd careke din dewleta faşîst û daraza wî ya bê edalet bidarizîne û serkeftina Kobanê pesend bike.



**Bi Netanyahu terbiyekirin!**

**Ahmet Aktaş**

Beşera şer a li Rojhilata Navîn, ne ya xêrê ye, roj bi roj şer û ceng germtir dibe û derbasî şerê yekser ê navbera dewletan dibe.
Rewşa şerê cîhanî yê 3yan, li alîkî herêma Ukranya, li aliyê din herêma Rojhilata Navîn û li vê herêmê jî pêşengiya vî karê qirker dane Receb û Netanyahu.
Her du jî di vî karê xwe yê qirêj de teqsîrê nakin, berovajî, mîna rikeberiyê bi lez û bez êrîşên xwe li herêmên di projeyên wan de ye didin meşandin.
Belê di vê êrîşa xwe ya diwî de Netanyahu, ya li ser Libnanê, weke ku gavekê derbasî pêş bû be. Lewma Receb, weke ku hinek hesidî be, hêrs bû dev avêt Netanyahu.
Di devjeniya xwe de zêde jî diçe û dibêje; "piştî van êrîşan armanca Netanyahu Tirkiye ye"!
Bêgûman ev derewek mezine.
Ji bo ku him bazirganiya xwe ya bi Israilê re bide veşartin, him ometa misilman û raya giştî bide xabapandin, xwe dijberî Netanyahu dide nîşandan.
Li aliyê din dewleta Tirk, endamê NATO ye û gava Israil êrîşî Tirkiyê bike, tê wateya êrîşî DYEyê û dewletên NATO hemûyan dike.
Lê Receb, êdî bi ti awayî nema dikare weke berê bi hêsanî raya giştî û gel bixapîne. Jiber ku fêlbazî û sixtekariyê wî ewqas pir bûne, êdî nema tên veşartin.
Em dîsa vegerin mijara êrîşên Netanyahu yên li dijî Libnanê û Suriyeyê.
Divê em li projeya mezin temaşe bikin. Di vê projeya stratejik a mezin de armanca sereke û bingehîn Îran e û aktorên sergovend ên vê êrîşkariyê jî Recebê Tirkiyê û Netanyahuyê Israilê ye.
Jixwe Netanyahu, vê armanca sereke venaşêrê, aşkere li ber ekranan dibêje.
Mînak, di vê êrîşa xwe ya dawî de bang li gelê Îranê dike û dibêje; "em ne li dijî we ne, em li dijî rejîma we ne", "em dostê we ne, em ne dijminê we ne", "yê neyarê we rejima we ya xeter e" û hwd.
Netanyahû, hîn jî pê de diçe û encamên êrîşên xwe û dema nêzik a ketina rejîma îslamiya Îranê jî destnîşan dike û dibêje; "gelê Pers û gelê Yahûd, du gelên kevnar in û wê di demek gelek nêz de, li Îranek azad bi hev re bijîn"…û hwd.
Li goreyî tê dîtin, stratejiya dewletên hegemonên xwediyê projeya cenga cîhanê ya 3san, bi destê Netanyahû û Receb, bi rêya hîn pirtir qirkirinê û terora dewletê, tirsê bi afirînin û bi vê şêwazê dewlet û hêzên dijberî xwe terbiye bikin.
Ev hilwest, gotina "bi rêya birçîkirinê terbiyekirin"tîne bîra mirovan.!
Jixwe ev herdu hilwestên "bi birçîhiştin û bi tirsê terbiye kirin" hevdû temam dikin û her nuha jî ev herdu stratejî bi hev ve tên meşandin.
Gelo bi van hilwestan, tektîkan û stratejiyan wê karibin gelê Filistin, gelê Kurdistanê û hwd.gelên mezlûm terbiye bikin û teslîm bigirin?
Erê heta nuha jiber van siyasetên qirker ên malxerab gelên me gelek zerar û ziyan dîtin, lê teslîm nebûn.
Gelên mezlûm, êdî şîarên "Berxwedan Jıyan E Û Jın Jıyan Azadî" ji xwe re kirine rêber!



# Medenî Ferho: Em ê bi hêza jin û ciwanan Kompoloya Navneteweyî têk bibin

Di 9'ê Cotmeha 1998'an de li dijî Rêber Apo Komployeke Navneteweyî hat destpêkirin. Rojnemevan Medenî Ferho diyar kir ku ji ber tirsa hêzên kaptalîzm ji fikr û felsefeya azadiyê ya Rêber Apo, hêzên navneteweyî û herêmî li dijî wî komplo dan destpêkirin.

**Amara Baran/ Qamişlo**

Di 9'ê Cotmeha 1998'an de li dijî Rêber Apo komployeke navnetewî pêk hat. Gelek hêz û dewletan di nava vê komployê de cihê xwe girtin. Yê ku yekser biryara komployê dabû Emerîka bû. Dewleta Tirk, hin dewletên Ewrûpa û hêzên herêmî jî di komployê de cihê xwe girtin. Di encama vê komployê de Rêber Apo hat dîlgirtin û radestî dewleta Tirk hat kirin. Armanca komplogeran gelekî mezin bû û hedefên wan berfireh bûn, lê negiştin tevahiya armancên xwe. Lewma hê jî komplo berdewam e. Di esasê xwe de ev komplo destwerdanek li Rojhilata Navîn bû. Rêber Apo ev yek gelek caran anî ziman. Bi girtina wî re şerê sêyemîn ê cîhanê



dest pê kir.
Derbarê Komploya Navneteweyî ya ku 9 cotmehê li dijî Rêber Apo hat destpêkirin rojnemevan Medenî Ferho ji rojname ya me re axîvî.

**`Rêber Apo gelê ku di gorê de hatibû hîştin zîndî kir'**

Medenî ferho di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Rêber Apo di hevpeyvîna xwe ya bi Yalçin Kuçûk re dibeje'Ez şervanê azadiyê me, azadî ji delalî û xweşikbunê pêk tê'. Rêber Abdullah Ocalan gelê ku di gora batonê de hatibû hîştin zindîkir û gihande radeya tekoşîna gelê şoreşger. Gelê kurd ku bi peymana Sykîs-Pîko hatibû fetisandin, kurdên ku ji jiyana bi rûmet û bi nirx bê par mabû bi saya Rêber Apo û PKK'ê derkete ser dika dîrokê, bû felsefeyeke hemdemî ku Rêber Abdullah Ocalan derxiste holê û di nava civakên bi rûmet yên cîhanî de cîhê xwe girt. Hem ji aliyê siyasî ve hem ji aliyê dîplomatîk ve bi vê pîvanê felsefeya Rêber Apo deriyê ronakbîriyê li pêşiya gelê kurd vekir."

**'Felsefeya Rêber Apo ji gotinê derbasî pratîkê bû'**

Medenî diyar kir ku şiyarbûyîna jinê di kelha moderînîteya kapîtalîzîm de cîheke mezin vekir, ev jî bû sedem ku hêzên hegemonîk bikevin nava tirseke mezin û wiha got: "Hiş û ramanên rewşenbiriyê û gotinê kete pratîka şerde, paradigmaya Rêber Abdullah Ocalan ji gotinê derbasê pratikê bû. Kompoloya Navneteweyî di rewşeke korsanî de ku pratîka wî li cîhanê ku yekemîn car derkete holê kirin e rojevê û pek anîn. Komplo heta roja me ya îro jî berdewam dike û komploger ji aliyê exlaqî û felsefeya sosyolojik a civakî de nirxên mirovahiyê dikujin û ji holê radikin."

**'Komploya ku tê meşandin ne normale '**

Medenî balkişand li ser Sîstema Işkenceyê li Îmraliyê û got, "Gireva Îmraliyê ji dadgeh û girtîgeheke taybet wirdetire minaka wî jî ew dadgeha îstîklalê weke destpêka dewleta Enqerê hate avakirin û pêkanîn. Dadgeha mafê mirovan ya Awropa jî dabû xuyakirin ku ew dadgeha ku tê kirin ne adile, pêwîste ji nû ve Rêber Abdullah Ocalan bê dadgehkirin, kompoloya ku li ser Rêber Apo tê meşandin ne normale û di rewşeke taybet de hat meşandin. Hê jî di rewşeke derewkulî de dewam dike Rêber Abdullah Ocalan ku modernîteya kapîtalîst wek dînasor bi nav kir, em îro jî dibînin ku komplo tecrîd derbaskiriye wekî dînasorekî dewam dike. Qanûnên ku bi netew dewlet avakirine û peymanên mafê mirovan ku ji bo xwe kirine bingeha jiyanê û hemû qanunên ku bi nav dikin hemuyan binpêdikin. Rêber Abdulah Ocalan di parazname ya xwe ya şaristanî de "Xadewendê tarî û Kralên tazî" yên serdemê de dibêje'Ne bi comerdî û bêbextî hemû nirxên mirovî hiqûqî û mafên mirovan yên gelan binpêkirin û êrîş kirin', niha rewşa kompoloya navnetewî ku di kesayeta Rêber Abdullah Ocalan de li dijî gelê kurd de hate li darxistin nişan dide."

**'Armanca tecrîdê vegera sykes-pîcot e'**

Medenî got ku "Reber Abdullah Ocalan wek pêşengê konfederalîzma rojhilata navîn derkete pêş Rêber Abdulah Ocalan rastiya ku dest û lingê ku civakê tenê nake civak derxist holê û got "dest ling û bedena bi mêjî ku dikare gotin û pratîkê bike yek û ji bo pêşeroja xwe ya azad tekoşîn bike dibe civak". Armanca tecrîda li hemberê Rêber Abdullah Ocalan bûye vegera serdema peymana sykes pîcot yanî îro ev sîstema li îmraliyê vegera destpêka şerê yekemîn ê cîhanêye û peymana ku di sala 1916'an de li el qaîrê hat îmzekirine . mîrzadeyên îhtîat û terakkî ku bune bavê Hîtler tunekirina gellê kurd kirine armanc, îro di êrîşên li başurê kurdîstanê de bêdengiya wan vî yeke nişan dide.

**'Tecrîda ku tê meşandin qirkirina kurdan e'**

Medenî wiha domand: "Di şerê cîhanê yekemîn de Kurdistan hat paçekirin di komploya navnetewî de hiş, ziman û bedena kurdan hat parçekirin û îro sîstema işkenceyê tê meşandin qirkirina kurda ne, ji ber ku çavkaniya şerê qirêj ku li KurdIstanê tê meşandin û dewleta tirk pêşengtiya vî tiştê dike ku hêzen navnetewî dengê xwe nakin tê wateya kawsekî mezin. Rêber Abdullah Ocalan rêya ber bi bûhiştê vekiriye û tevahî zanistin cîhanê dibêjin ku paradigmaya Rêber Apo çavkaniya çareseriya pirsgirêkane. Bi sedan xelatgirên Nobelê feylesof, akademisyen,



hûnermend û rojnamevan û saziyên hûquq û siyasetmedar ku dewa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan dikin û dibêjin bi azadiya Abdullah Ocalan pirsgirêka Rojhilata navîn bê çareserkirin. Paradigmaya Rêber Apo sîstema cîhanê hêjand û gîha gelê kurd yên ku bi awayek kolektîf bi şoreşgerî hereket bike. Moderînîteya kapîtalîst her dem li hemberê lîderên sosyalîst û lîderên civaka ku daxwaz dike azad bibe û sîstema xwe biguhere serî li rêya tecrîdê didin. Xefikên li pêşiya kurdan gelek dijwarin ji ber ku kurdîstan buye çavkaniya li rojhilata navîn û cîhanê mafê gelan diparêze û dixwaze, tevger azadiya kurd jî wek pêşengê vî daxwazê derketiye pêş. Tecrîda heyî hem qanûnê civakî û exlaqî yên dijmirovî derbas dike.

**'Jin û ciwan wê hêza xwe bikin yek û komployê têk bibin'**

Medenî di dawiyê de bang kir û got, "Pêwîste gelê kurd bi hemû hêza xwe tekoşînê bikin û li çar parçeyan de xwe birêxistin bikin. Pêwîste ciwan her qada azadiyê bikin cîhê berxwedanê û destekê bidin tevgera azadiya kurdistanê. Jinên kurd hem li kurdîstanê hem jî li dervay welat û li cîhanê bi kesayetên jinan re bikevin nav diyalogê û hez xwe xort bikin. Medya Azad ya kurd rojnemevan, nivîskar, rewşenbîr, akademisyen fikir û ramanên Rêber Abdullah Ocalan destek bikin û gelê kurd di aliye kolektîf de şiyar bikin û bibin pêşeng ji civakê re. Gelê kurd li welat û dervay welat ji bo şikandina tecrî dê û misogerkirina azadiya Rêber Abdullah Ocalan tekoşîneke xort bidin meşandin."

**FENER**



**Awazê senteza Rêber Apo ya azadiyê dilê milyonan dilerizîne**

**Idrîs Henan**

26 sal di ser Komploya Navneteweyî ya li dijê Rêber Apo li dar ketiye re derbas bûn. Îro jî heman komplo bi şêwe û rêbazên nû di navenda şerê cîhanê yê sêyemîn de dewam dike.
Bi gotinek din; lidarxistina komploya navneteweyî ya li dijî Rêber Abdullah Ocalan, ji bo hêzên modernîte û mêtingeriyê ku ji nû ve Rojhilata Navîn dîzayin bikin, hewceyek bûn û nebûnê bû. Lew re jî partî, tevgerên siyasî, welatên herêmê û yên cîhanî cihê xwe di komployê de girtine û hevkariya reş li dijî tevgera azadiya Kurd, di şexsê Rêber Abdulah Ocalan de pêk anîne. Rêber Apo derketina xwe ji Sûriyê ya 9 Cotmeha 1998an weke mezintirîn oparasyona NATO`yê pênase dike ku piştî 126 rojan, 15 Sibata 1999an radestî Tirkiyê dikin û ev bû 26 salin li Îmraliyê dîl tê girtin.
Pêwîste li rex rola hegemoniyê û hêza dendik a modernîteya kapîtalîst, Gladyo, mirov baş têbigihêje rola îxaneta hindirîn û wê riswa bike. Bê guman dema mirov qala wê yekê dike, ji bilî velerizîna ku bi bedena mirovan dikeve, derhal rola ajantiya PDK di ber çavan re derbas dibe ku 33 sal in bi dagirker, mêtinger û kujerên Kurdan re, li dijî îradeya Kurd û gelên Kurdistanê tev digere. Çi destkeftiyên Kurdan li kuderê hebin şerê wan dike û di oxira wê de jî, mil bi mil, bi dagirkeran re êriş dike. Bi vî awayî jî ajantiya di komploya navneteweyî de dewam dike.
PDK ji bo tunekirina Partiya Karkerên Kurdistanê PKK, li her derê bi her kesî re ketiye nava hevkariyê û cihê xwe di komploya li dijî Rêber APO de girtiye. Ji xwe Rêber APO li ser PDK gotiye; Rêxistina rajoriyê ya parallelî Îsraîlê û girêdayî NATO`yê ye. Her wiha Rêber APO rola îxaneta PDK û zerarên ku digihîne doza Kurdan dinirxîne û dibêje; ziyana ku PDK daye Kurdan, di ti serdemên dîrokê de, bi ti partiyeke dîtir re nayê rûbirûkirin.
Diyare ev rola modernîteyê daye PDK ne tiştekî ji nişkêve ye, her hal rolek organîk û girêdayî sedemên avabûna wê ye. Ji ber vê yekê jî li kuderê bizavên Kurdan derb xwaribin, tiliya PDK tê de heye. Ev rol wisan mezin dibe û ji bo ku firsendeke jiyanê di nexşeya "Rojhilata Navîn" ya nû de bigire, ji kêliyên fikirînê de bigire heya pratîzekirina plananên qirêj were, cihê xwe digire. Ji ber vê jî li paytexta Îrlandayê Diblin 1995, li paytexta Amerîka Waşînton 1998, li paytexta Urdinê Eman 2014, li Bexda, Tehran, Şam û Enqerê civînên cuda cuda bi hêza hegemoniya global, îsraîl, DAIŞ û çeteyên terorîst re hevakarî kiriye û li dijî îradeya Kurd li Mûsil, til Efer, Şengal, Efrîn, Serê Kaniyê, Girê Spî û tevayî beşên Kurdistanê rola esas di komploya navneteweyî de girtiye. Ji xwe PDK vê yekê înkar nake û gelek zelal û eşkere misoyneriya xwe bi cih tîne. Serokê wê Barzanî dema ku dibêje; "Ewlehiya Tirkiyê û Kurdistanê girêdayê hev û din in" wê hevkariyê tekez dike û rola partiya xwe di komployê de deşîfre dike.
Lê tevî vê êrîşa dijwar a ku çarenûsa gelê Kurd di şexsê Rêber APO de hedef digire ku 26 sal di ser re derbas dibin, hêzên hegemoniyê û yên hevkar û îxanetê nekarîne bigihin armancên xwe, berevajî, îroj paradîgmaya Rêber APO dîwarên Îmraliyê hilweşandine û awazê senteza wî yê aşîtî, demokrasî û azadiyê dilê milyonan li cihanê dilerîzne.